

ARMANC Û PİRSGİRÊKÊN PÊVAJOYA STANDARDÎZASYONA KURMANCÎ

Resul GEYİK

Zaningehe Mardin Artukluyê, Beşa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî,
resulgeyik@artuklu.edu.tr, ORCID: <https://orcid.org/0000-0003-3516-098X>

Article Types / Makale Türü: Research Article / Araştırma Makalesi
Received / Makale Geliş Tarihi: 01/06/2025, Accepted / Kabul Tarihi: 16/06/2023
Doi: <https://doi.org/10.26791/sarkiat.1711424>

Ev gotar di 5ê Gulanê 2024an de wekî kurte di konferansa Nûbihar Akademiyê de hatiye pêşkêşkirin.

Armanc û Pirsgirêkên Pêvajoya Standardîzasyona Kurmancî

Kurte

Standardîzasyona zimanekî ne tenê mijara sosyolînguîstîkê ye, ew di heman demê de mijareke îdeolojîk, têgehî û teorîk e jî. Standardîzyona zimanekî tu caran di carekê de pêk nayê, li gelek welatên cuda jî bi awayekî taybet pêk hatiye û pêvajoyên cur bi cur wekî pêwîstî derdikeve pêşiya hemû xwendekar, fêrxwaz û bikarhêneran. Elbet ev pêvajo ne kurt e û pirsgirêkên cihê derdikevin. Yekitiya bikaranîna zimanekî di qada ferhengî, rêzimanî û hêmanên din ne tiştekî rehet e lewma gelek zanîngeh, sazî, komele, weqîf û weşanxane bi rêya hevdîtinan hewl didin ku bigihîjin biryareke giştî. Hebûna saziyeke otorîteyê (dewletî) vê pêvajoyê bi awayekî kontrolkirî dixêrê. Herwiha îstînayên wekî kurdî û zaravayên wê gelek pirsgirêkên nişkeva yan jî surprîz derdixin. Wekî mînak kesek ku xebatên zimên pêk tîne dikare taybetmendiyeke herêmî an jî kêmtirîn (ne berbelavbûyî) wekî qeîdeyeke tercîhkirî bi kar bîne û di nav demê de ev jî bibe sedema hinek aloziyan. Pirsgirêkên giştî yên standardîzasyona kurmancî bi çend astengan re rû bi rû dimînin, Pirsgirêkên giştî wiha ne; cudahiyên siyasî û çandî di nav kurdên welatên cuda de, nenaskirina fermî ya kurdî, cudahiyên zaravayî, kêşeyên perwerdeyê, hebûna zimên bi awayekî şînkirî ya medya û edebiyatê, kêmasî yan jî nebûna piştgiyariya navneteweyî û faktorên dîrokî yên berê. Ev faktor bi hev re rê li ber pêşxistina formeke kurmanciya kurdî ya ku ji aliyê gerdûnî ve hatiye qebûlkirin û standardkirin ji bo mebestên perwerdeyî, îdarî û ragihandinê yên fermî asteng dikin. Hewldanên berdeham ên di vî warî de dibe ku bi awayekî cuda pêk bê û ji bo qebûlkirinê demeke dirêj pêwîst be. Ji bo standardkirina zimanekî hin gavên bi hev ve girêdayî pêwîst in. Ew gav bi gelemperî wiha ne; hilbijartin, berfirehkirin, kodkirin û qebûlkirin. Di vê pêvajoyê de, afirandina çavkaniyên rêziman, ferheng û pêwîstiyên cihê wekî medya û huquqê jî gelek giring in.

Bêjeyên Sereke: Standardîzasyon, Ziman, Zimanasî, Kod, Sosyolînguîstîk, Kurdi/Kurmancî

The Objectives and Challenges of Standardization Process of Kurmanji

Abstract

The standardization of a language poses not only sociolinguistic challenges but also ideological, conceptual, and theoretical considerations. Language standardization is a gradual process, varying in approach across different countries and requiring various stages for students, learners, and users. This process is typically lengthy and may encounter diverse issues. Achieving uniformity in vocabulary, grammar, and other linguistic elements is challenging, prompting numerous universities, institutions, associations, foundations, and publishers to convene meetings in pursuit of consensus. Oversight by a governing body, such as the state, facilitates this process in a regulated manner. Nevertheless, exceptions like Kurdish and its dialects introduce sudden or unexpected complications. For instance, a language practitioner might adopt a local or less common feature as a preferred rule, potentially leading to subsequent issues over time. The general problems of Kurdish standardization encounter several obstacles, the general problems are as follows; political and cultural disparities among the Kurds of different countries, the absence of official recognition of Kurdish, dialectal variations, educational challenges, the limited representation of the language in the media and literature, lack of international support and historical factors. These challenges collectively impede the development of a universally accepted and standardized form of Kurdish language for official educational, administrative and communication purposes. Achieving consensus in this regard may entail diverse approaches and considerable time for acceptance. Some interrelated steps are necessary to standardize a language. Typically, standardization involves several interrelated steps such as selection, elaboration, coding, and acceptance. Within this process, the creation of grammar, vocabulary and local requirements such as media and legal frameworks hold significant importance.

Keywords: Standardization, Language, Linguistics, Code, Sociolinguistics, Kurdish/Kurmanji

Kürtçe'nin Standartlaşma Süreci Amaç ve Sorunları

Öz

Bir dilin standartlaştırılması sadece toplumdilbilimsel zorlukları değil aynı zamanda ideolojik, kavramsal ve teorik hususları da beraberinde getirir. Dil standardizasyonu kademeli bir süreçtir, farklı ülkelerdeki yaklaşımlara göre değişir ve öğrenciler, öğrenenler ve kullanıcılar için çeşitli aşamalar gerektirir. Bu süreç genellikle uzundur ve çeşitli sorunlarla karşılaşabilir. Sözcük dağarcığı, dilbilgisi ve diğer dilbilimsel unsurlarda tekdüzelik sağlamak zordur ve çok sayıda üniversite, kurum, dernek, vakıf ve yayıncının fikir birliği arayışıyla toplantılar düzenlemesine neden olur. Devlet gibi bir yönetim organının gözetimi, bu süreci düzenli bir şekilde kolaylaştırır. Bununla birlikte, Kürtçe ve lehçeleri gibi istisnai durumlar ani ya da beklenmedik komplikasyonlara yol açmaktadır. Örneğin, bir dil uygulayıcısı yerel ya da daha az yaygın bir özelliği tercih edilen bir kural olarak benimseyebilir ve bu da zaman içinde potansiyel olarak müteakip sorunlara yol açabilir. Kürtçenin standardizasyonuna ilişkin genel sorunlar, farklı ülkelerdeki Kürtler arasındaki siyasi ve kültürel farklılıklar, Kürtçenin resmi olarak tanınmaması, lehçe farklılıkları, eğitim sorunları, dilin medya ve edebiyatta sınırlı temsili, uluslararası destek eksikliği ve tarihsel faktörler gibi çeşitli engellerle karşılaşmaktadır. Bu zorluklar toplu olarak, resmi eğitim, idari ve iletişim amaçları için evrensel olarak kabul edilmiş ve standartlaştırılmış bir Kürtçe dilinin geliştirilmesini engellemektedir. Bu konuda uzlaşa sağlanması, farklı yaklaşımları ve kabul için önemli bir zamanı gerektirebilir. Bir dili standardlaştırmak için birbiriyle ilişkili bazı adımlar gereklidir. Tipik olarak standardlaştırma, seçim, detaylandırma, kodlama ve kabul gibi birbiriyle ilişkili birkaç adımı içerir. Bu süreçte dilbilgisi, kelime dağarcığı ve medya ve yasal çerçeveler gibi yerel gereksinimlerin oluşturulması büyük önem taşımaktadır.

Anahtar Kelimeler: Standardlaşma, Dil, Dilbilim, Kod, Sosyolinguistik, Kürtçe/kurmancca

DESTPÊK

Mijarên pratîka zimên û lêkolînên çandî bi salan e li cihên ku kurdî tê axiftin, hînkirin û lê çavkanî tên amadekirin gelek tene nîqaşkirin. Yek ji wan mijaran jî standardkirina zimên e. Standardkirina zimanê kurdî xebateke jênegere ku bandora wê li ser civakên kurdîaxiv heye. Standardîzasyona zimanekî bi xwe re standardên din jî tîne (Omer, 2012, 75). Bo minak, ya ortografîk, peyvki, rêzimanî, perwerde, medya û hwd. Gihîştina standardkirina zimên ne tenê ji bo parastin û pêşvebirina nasnameya çandî amrazek e, lê di heman demê de ji bo hêskirina peywendiyên bibandor, perwerdehî û îdarî rêyek e. Di vê gotarê de, em ê li ser diyarkirina armanc, kêşe û pirsîrêkên girêdayî standardkirina kurdî bi taybetî li ser rewşa kurmancî bisekinin û pirsîrêkên vê pêvajoyê binirxînin.

Li gorî Ramlan (2018, 28) zimanê neteweyî ji bona wergirtina şêklê fermî divê bê standardkirin. Zimanê standard di eslê xwe de (di destpêkê de) zimanê eşîrêkê ye ku axiver giş ji heman nijadî ne û xwediyê heman edet, ziman, dîn û tiştên din in. Dema mirov li standardbûna zimanên wekî îngilîzî û almanî binêre, heman tişt derdikeve pêşîya mirovan. Ziman, ji ber ku di nav hemû endamên civakê de wekî amrazê ragihandinê tê bikaranîn, di jiyana mirovan de xwedî roleke mezin e. Ziman ji sistemeke ragihandinê pir wêdetir e û nîşaneke sembolîk e ku di nav civakê de kî ji komekê ye û kî li derve ye ji hev cihê dike. Ziman bi awayekî kevneşopî jî mêtî ve wekî taybetmendiyeke navendî ya nasnameya etnîkî û neteweyî tê dîtîn, ji ber vê yekê, nasname bi zimanê ku bi kar tê, tê nîşandayîn. Wekî din, zimanê standardîzekirî rêyek e ku piştgiriya dide nasnameyê heveş. Lewma ziman dibe temsîla sembolan ku bi tercîha peyv û hevokan, bi fonetîk an jî cureyên axaftinê ku bi hêsanî mirovan li gorî herêman disenifîne. Bascoboinik (2008, 1) dibêje ku elbet her netewên¹ cuda xwedî nijad, eşîr û zimanên cuda ne û ev tişt bi nêrîneke antropolojîk bi nêrîtkî wekî taybetmendiyeke navendî ya nasnameya etnîkî tê qebûlkirin.

Standardbûn ew pêvajoyê ye ku tê de ziman ji bo formên wê yên zimanî û fonksiyonên ragihandinê yên civakî standard dibe. Zimanek di pêvajoya standardkirinê de standard dibe. Standardîzasyona zimanî pêvajoyek e ku bi gelemperî hewceyê hin amadekirinên baş e. Di ser re gavên plankirî û prosedûrên sistematîk ji bo gihîştina wê divê baş bibe nixandîn. Têkildarî nêrîna fermîbûn an standardbûna zimên, mirov dikare zimanan bike du cure: *Zimanê standard û zimanê nestandard*. Holmes (2001) cureyê standard wiha pênase dike;

“Bi gelemperî zimanê ku hatiye nivîsandin û ya ku heya radeyekê pêvajoya asayîbûn an jî kodkirinê (wekî mînak, wekî di rêziman û ferhengê de tene bikaranîn) derbas bûye; ew jî hêla civatekê ve wekî kodeke bi prestîjê tê nas-kirin”.

Pêvajoya ku zimanekî dike standard wekî *“standardkirina zimên”* tê binavkirin. Wardhaugh (2006, 15) standardîzasyona zimên wiha pênase dike: “Ev pêvajoyê ye ku zimanek bi formeke kodkirî derdikeve û cihê xwe digire. Ew pêvajoyê bi gelemperî pêşketina tiştên wekî rêziman, pirtûkên rastnivîsê, ferheng û ihtîmaleke mezin wêjeyê jî dihevinê”. Ev pênase du taybetmendiyan sereke nîşanî me dide: Zimanê nivîskî temsîla zimanekî ye ku bi navgîniya pergala nivîsinê û bi rêkûpêkkirinê tê nasîn: armanc ew e ku çêkirina zimanê diyarkirî ku ji xwe qanûnî yan fermî ye. Ji ber vê yekê, zimanê standard zimanekî taybet e, ku jî hêla pir kesan ve rast û qebûlkirî ye û ew ziman e ku bi gelemperî ji aliyê gel ve tê bikaranîn. Ew bêtir bi zimanê nivîskî ve têkildar e, ku tê de taybetmendiyan rastnivîsê hene; morfolojî (yanî forma peyv); û hevoksazî (yanî ji bo ku di zimanekî de hevok bibe çêkirin rêzkirina peyv û bêjeyan e).

Gelek pispor hene ku hewl didin kes an jî saziyan diyar bikin ku di pêvajoya standardbûnê de wan berpirsiyar bikin an jî girêdaneke bi hev re çêbikin, yek ji wan jî Duranti (1997) ye ku wiha difikire û xwe wiha îfade dike;

“Çêbûna dewletên neteweyî standardbûnê ferz dike. Pêvajoya damezrandina dewletê şertê ji bo bazareke yekbûyî ya zimên diafirîne ku tê de yek cureyek zimanî statuya standard dixe zimên.”

Ev balê dikşîne ser hebûna netewedewleta ku berpirsiyarê standardkirinê ye. Bi gelemperî dewletên neteweyî serî li hikûmetê didin û vê pêvajoya standardkirinê pêk tînin. Herwiha, Bourdieu (1991, 105) îdia dike ku zimanekî standard encama pêvajoyên sosyo-polîtîk e û saziyên burokratîk yên wekî dibistanan bi xwe jî girêdayî vê pêvajoyê ne. Nêrîna Bourdieuyî dibistanan wekî cihê standardîzasyona zimanekî bi nav dike. Di vê rewşê de, ji ber ku ew rasterast bi pisporên zimên an zimannasan ve girêdayî ne lê ji ber ku li dibistanan ziman tê bikaranîn, çavdêriya vê pêvajoyê tê şopandin, dibistan xwediyê roleke mezin û giranbiha ne.

Li ser bingeha van ramanên cuda ku li jor hatin şirovekirin, saziyêke dewletê û saziyên burokratîk an jî pisporên

1 Wekî mînak, ger zimanê fermî hebe, standardîzasyona zimên ji bo hemû axiverên zaravayan rehetîyeke mezin e. Bo mînak, Li Almaniya, Swîsre û Awûstiryayê zimanekî hevpar heye bi navê *Hoch Deutsch (almaniya bilind)* tê binavkirin ku di perwerdeyê de bi kar tînin. Herwiha almaniya ku li Swîsreyê tê bikaranîn tenê ji aliyê Swîsyan ve tê famkirin û li Almanyayê yan jî li Awûstiryayê nayê famkirin, le dema bi kesekî ji her sê welatan yekî re biaxivin *almaniya bilind* tercîh dikin.

zimên berpirsiyar in ku hinek plansazî û polîtîkayên di derbarê standardkirina zimanê kurdî de bifikirin û bi pêş bixin. Ji bo kurmançî di serî de kovara *Hawarê*; ji bo soranî Akademiya Zimên; *Vate* ji bona kirmançî (zazakî); SZK ji bo kurmançî xwedî hêzek û bandoreke mezin in. Wekî hatiye nîşankirin, zarava bi saziyên cuda pêvajoya standardkirinê tecrube dikin.

Standardbûn ji zimanê axaftinê bêtir bi zimanê nivîskî ve girêdayî ye (mînak peyvسازی, morfolojî û hevoksazî). Bo mînak, taybetmendiya zimanê fonolojîk bi perwerdeyê standardîze dibe. Ew pêvajo bi gelemperî pêşketina tiştên wekî rêziman, pirtûkên rastnivîsê, ferheng û bi hebûna hêmanên çandî bi taybetî jî wêjeyê di nav xwe de dihevin û bi bikaranîna zimên hinek tişt di nav demê de di nav zimên de li gorî tercîha însanan şiklê xwe yê dawî digirin û guherîna xwe temam dikin. Ev pêvajo çend hêmanên sereke dihevin: Sazkirina rêgezên rastnivîsê; diyarkirina qaîdeyên rêzimanê ji bo standardkirina binyada hevokê û rêza peyvên û afirandina ferhengên fermî. Wekî din, hilbijartina pergaleke nivîsandinê, wekî alfabe an koma karakteran, di vê pêvajoyê de roleke giring dilîze. Herweha, bipêşxistina materyalên perwerdeyê yên standardkirî, mîna pirtûkên dersê û rêbernameyên hînkirinê jî, di hînkirin û bikaranîna zimên de domdariyeke bêtir bi cih tînin (Crystal, 2003; Fishman, 1974). Ji ber vê yekê, nivîsandin aliyekî bingeînê standardkirina zimên e ku rêgezeke hevgerî û birêkûpêk a ragihandin û parastinê dide. Ji bo famkirina têkiliya di navbera zimên û çandê de, bandora dorhêlî ya wan a li ser nêrîna çandî û dîroka civakî bi awayekî cuda giring e. Ragihandina bingeîn û belkî ya herî tevlihev bêguman ziman e ku ew jî bi kombûna peyvên ku tên ba hev watayên cuda çêdikin (Geyik, 2020, 162). Standardbûn rasterast guherîna zimên kontrol dike û zimanên nestandard ji ber gelek faktorên cuda zûtir û bi awayeke bêkontrol dikevin nav dirûv û formên nû. Hinek ji wan “pêvajoya qelsbûnê” dijîn hinek ji wan jî tenê din nav hawirdoreke biçûk de dimînin.

Ji ber vê yekê, li gorî fikir û ramanên ku li jor hatin ravekirin, hin taybetmendiya zimên ên standardkirî wiha ne:

- » Rêziman (Grammar)
- » Rastnivîs (Orthography - Correct Writing / Spelling)
- » Peyv (Vocabulary - Lexicon)
- » Bilêvîkirin (Pronunciation)
- » Pergala nivîsandinê (Writing System)

Standardbûn di her zimanî de pêvajoyeke pêdivî, jêner û giranbiha ye. Deumert (2004, 18) dibêje ku nêzîkatîyên zimanparêzî yên ji bo standardkirina zimên bi gelemperî li ser tespîtîkirina zaravayên herêmî û yên pir civakî (yên ku di civakê de gelek tê tercîhkirin) ne. Piştî vê tercîhê dema standardbûna zimanekî de bertekên nû û cuda derdikevin. Xebata Lane'ê (2014, 9) li ser bertekan di dema standardîzasyonê de ji bo kesên alîgir û dijberên vê pêvajoyê wiha tê senifandin:

- » Yên Redker (Rejecters): standardekê naxwazin
- » Yên Berxweder (Resisters): hinek beşên standard qebûl dikin lê yên din qebûl nakin
- » Yên Dervemayî (Excluded): ji bo bikaranîna standard kêmasiya çavkaniyan dijîn
- » Yên Derxistî (Expelled): kesên ku ramanên wan tene piştguhkirin an jî tune tene hesibandin.

Li gorî vê nêrîna Lane'ê em dibînin normal e ku bertek ji ber sedemên cihê derkevin û hinek kes yan jî kom li gorî biryara giştî tev nagerin. Wekî li jor hatiye dayîn hinek kes biryarên nû red dikin, hinek ji wan hinek tiştan qebûl dikin, hinek kes jî vê pêvajoyê tene derxistin û hinek jî qet bi awayekî cidî nayên girtin.

Metodolojiya xebatê

Wekî metod me *rêbaza modela plurisentrîk* ya standardîzasyonê bi kar anî. Ev modela ku hate bikaranîn du yan jî sê standardên ku di zimanekî de derdikevin dinirxîne. Herçiqas mijara gotara me kurmançî jî be, li gorî vê metodê pêwendiyên zaravayên din jî dema pêwîstî hebe dikare bê nixandîn.

Çarçove: Lêkolîn bi berçavgirtina çarçoveyên dîrokî, civakî, siyasî û zimannasî li herêm û civakên cuda li ser pêvajoya standardkirina zaravayê Kurmançî yê Kurdî disekine.

Armanca vê gotarê destnîşankirin û nixandina armanc û pirsgirêkên têkildarî standardkirina Kurmançî ye ku ew jî girêdayî afirandina normên zimannasî (wek rêziman, rastnivîs û ferheng) ye. Elbet têgihîştina bandorên li ser parastina çandî, ragihandin û perwerdeyê jî girêdayî vê ye.

Çarçoveya Têgehî: Lêkolîn modelek pirnavendî û ji jêrberbejorê ve ya standardkirina ziman dipejirîne û nebûna desthilatdariyek dewletê ya navendî mecbûr dike ku biryargirtina ji hêla civak û saziyên zimên ve pêk bê. Loma biryarên bêne girtin li gorî zimanê civakê tê. Tercihên giştî yên gelî bandorker in.

1. Pêvajoya Standardîzasyona Zimên

Pêvajoya standardîzasyonê li gelek welatan bi awayekî cuda pêk hatiye û pêk tê jî. Lê bi giştî gelek tiştên hevpar hene. Pêvajoyên standardkirina zimên ev in: *hilibjartin*, *kodkirin*, *berfirehkirina fonksiyonê* û *pejirandin* (Haugen, 1966, 32 - 33). Haugen li vir dibêje ku formên nû yên standard divê bi awayekî xwezayî bêne hilibjartin û derkevin asta formên gelemperî. Dema wekî ku Haugen destnîşan dike eger ew ziman bi awayekî xwezayî neyê hilibjartin çî dibe, ev jî meseleyeke din e ku mirov li ser bisekine. Ev rewşa navborî ji bo kurmancî çawa ye dê di vê gotarê de bê nirxandin û pêşniyaz jî bêne dayîn. Ji bo standardkirina zimanekî hin gavên bi hev ve girêdayî pêwîst in (Holmes, 2001, 35). Di sosyolînguîstîkê de, ew gav bi gelemperî wekî jêr in:

Hilibjartin: Hilibjartina zaravayî yan jî devokê gaveke gelek giring e. Ji ber ku varyasyona ku bê hilibjartin wê gelek bê bikaranîn û bi pêş bikeve. Ev tê wataya hilibjartina cureya ku wekî standard dê bê hilibjartin. Divê ev cure xwediyê giringiyeke sosyal û siyasî be ku di nav axiveran de xwediyê prestîjekê be. Bi piranî, meyla hilibjartina cureyê li ser bikaranînen gelemperî ne. Herçiqas meyla giştî li ser cureyek be jî, guherbariya zimên ji bo hemû zimanan tişteke giştî ye jî. Lê kêmkirina wê heke ne ji holê rakirina vê asta bilind a guhebariyê be standardkirina zimanekî ji bo kêmkirinê hewldanek e (Stadler, 1983) Yanî li vir Stadler dibêje ku armanca standardkirinê ew e ku cudahî û nakokiyên giring kêmkir bike yan jî sînodar bike. Di hinek rewşan de, armanca standarkirinê ew e ku hinek cudahiyan bi giştî ji holê rake. Ev asta bilind ya guherbariyê dikare xwe di her beşên zimên de nîşan bide. Pirsgirêk tenê bi hilibjartina zaravayekê jî naqede elbet. Ferguson (1996) jî bo vê meselê fikira xwe wiha îfade dike: pirsgirêka mezin ya zimanên kêmar wiha ye: varyasyon, hilibjartina forma zimên ya “herî baş” e.

Kodkirin

Kodkirin ji bo afirandina rêzik, rêgez û normên zelal û desthilatdar di pêvajoya standardkirina zimên de qonaxeke giring e û ev bi fermîkirin û sistematîzekirina zimên ve girêdayî ye. Pîvan û rêzikên rêzimanê, bikaranîn, ferheng û xebatên hwd. divê ji bo siberojê bêne amadekirin. Zaravayê ku bê hilibjartin dê di belgeyên fermî de bê bikaranîn, li dibistanan bê fêrkirin û ji hêla biyaniyan ve bê bikaranîn (Holmes, 2001). Bi vî awayî, bandora zimên roj bi roj dê zêdetir bibe. Ev cure di ferheng û pirtûkên rêzimanê de tîr nivîsin da ku formên rast bîr hînkirin û bikaranîn. Berbelavkirina materyalan di medya, perwerde û qadên fermî de wê pêvajoya kodkirinê zelaltir bike û rehetîyeke mezin bide. Herwiha kêmasiya çavkaniyan divê bê çareserkirin û materyal bêne amadekirin. Wê demê pirsgirêka mezin tê dîtin ku gelek varyasyon di jiyana de bi fonksiyon in lê di nivîsê de divê ev ast gelek sînodar be. Dean û Fowler (1974, 302) îdîa dikin ku ji bo standardîzasyona perwerdeyê tenê divê zaravayek bê tercihkirin (teoriya jêbirinê; eradication theory). Ev îdîa dikin ku hemû xwendekar li dibistanan divê zimanekê hevpar hîr bibin û ji zarava û devokên xwe dûr bixin. Ferguson (2006, 21) wê rewşê wiha îfade dike; standardîzasyona dîroka zimanên neteweyî de ziman wekî “binyadkirina zimên” tê binavkirin. Lewma standardîzasyon vê pêvajoyê bi pêş dixê û îlham dide kesan. Di ser re, Garvin (1993,41) zimanê kodifiye wiha pênasê dike: ew zimanê ku “cureyek kodkirî ya zimanekê ku ji hewcedariyên ragihandinê yên civateke axaftinê re xizmet dike”. Yanî, li gorî Garvin, zimanê standard wî zimanî pênasê dike ku formeke standardkirî ya ku pêdiviyên ragihandinê yên cihêreng û tevlihev ên civakê pêk tîne.

Berfirehkirin:

Berfirehkirin ji bo peydakirina hewcedariyên civakê di warên cihê de ew pêvajoyek e ku tê de zimanek tê berfirehkirin û nûjenkirin. Ev tê wataya pêşxistina ferheng, binyad (rêziman) û bikaranîna nû da ku ziman ji bo qadên teknîkî, fermî yan akademîk bêne bikaranîn. Divê bikaranîna norm û qaîdeyên rêzimanî ku li ser cureyên hilibjartî bîr formulekirin û bi awayekî teqez di rêziman, ferheng, rastnivîsîn, destnivîs, metin û hwd. de werin destnîşankirin. Zaravaya hilibjartî bi rêzimanekê nivîskî û ferhengêkê tê dayîn da ku ew di belgeyên fermî de bê bikaranîn, li dibistanan were hînkirin û ji hêla biyaniyan ve ji bo hînbûnê bê bikaranîn (Holmes, 2001). Bikaranîna fonksiyonên zimên qadên nû berfirehtir dike. Ji bona berfirehkirina zimên wekî pêşniyaz divê qîmeta zimên bê dayîn, axiverên wî zimanî bîr teşwîqkirin da ku bi zimanê xwe serbilind û şanaz bin ji ber vê rewşê pejirandina dê bê parastin da ku her kes bikaranîna wê qebûl bike. Ev hestên pozîtîf tîkiliya mirov û zimanê wan geştir dike. Zaravayek bi armanca standarkirinê tê hilibjartin. Zaravaya hilibjartî dibe ku yek ji wan zimanên bihêztir û di nav komên bîr perwer-

debûyî de be ev jî wê rewşa wan ji ber sedemên cuda çêtir bike. Dema rewşa zimanê kurdî û zaravayî bê nîrxandin ji ber sedemên cografayên cuda, tê dîtin ku her dever xwediyê bandorên cuda ne. Lê bi gelemperî ji ber ku gelek kovar, weşanxane û rojnameyan, standardîzasyona *Hawarê* hîlbijartîye, niha ekola *Hawarê* bêtir tê tercîhkirin. Ev jî xala berfirehkirinê berbelavtir dike.

Ev pêvajoya standardkirinê pêvajoyek e ku gavên têne avêtin girêdayî hev in lewma divê siyasethedar, zimanas, kes û saziyên din bi hev re gavan biavêjin. Ev pêvajoya standardîzasyonê di heman demê de tê wataya guherîna zimên bi awayekî kontrolkirî ji ber ku zaravaya hîlbijartî varyasyonên din li paş xwe dihêlin û berê xwe fireh dikin.

Qebûlîkirin (Pejirandin)

Qebûlîkirina normên cur bi cur ji aliyê civakê ve carinan dibe sedema gengeşiyê di navbera herêm û şexsan de ku ev jî dikare bibe sedema rikberiyê. Dema sazî hebin, ev kar bi rehetî pêk tê, yan na ev pêvajoyeke zehmet e. Forma di serî de hatiye qebûlîkirin wekî forma herî baş tê dîtin lê bi demê re” ev dibe zimanê hevpar. Herwiha yên nehatine qebûlîkirin jî dikare wekî formên biçûkdîtî bêne dîtin. Lewma di nav zaravayên din de hewldana bipêşxistin an pesindayîna zaravayên din derdikeve pêş mirov. Wekî tê zanîn di navbera zarava û devokan de hertim rekabetek heye û ji ber vê her kes bikaranîna devok û zaravaya xwe tercîh dike. Lewma zaravaya ku bê qebûlîkirin wê bi demê re, bibe xwediyê danasîn, berbelavbûn û bihêzbûnê. Ev yek bi rêya sazî, dezgeh, saziyên wek dibistan, wezaret, çapemenî, dezgehên çandî û hwd. tê kirin (Holmes, 2001). Bi demê re, êdî zaravaya hîlbijartî dibe zimanê hemû qadên jiyanê û wekî ziman bi xwe û cureyên herêmî hêdî hêdî wenda dibin².

Bi kurtî, Haugen (1966, 34) ev çar krîteran navborî li gorî form û nêzikatî-fonksiyonên xwe wiha disenifîne:

	Form	Fonksiyon û nêzikatî
Civakî	Hîlbijartin	Qebûlîkirin
Lînguîstîkî	Kodîfikasyon	Berfirehkirin

Di vê pêvajoyê de, elbet hinek gavên giring hene ku divê neyên îhmalkirin. Ev bi giştî wiha ne; *perwerde*, *çand*, *siyaset*, *ekonomî*. Zimanên standard bi xwe yan jî bêalî çênabin; ew wekî encama pêvajoya standardkirina zimên derdikevin. Armanca bîngehîn a standardkirina zimanekî ew e ku danûstandinên di navbera zaravayên herêmî û civakî yên zimanî de hêsan(tir) bike û guherîna cur bi cur kêmtir bike. Lewma dema berhemek an jî xebatek çêdibe zimanê standard bikaranîna zimên ya hîlbijartî û nasnameya zimên jî derdixe (Haugen, 1966, 22). Ev jî di deme de zimanê standard bihêztir dike.

Curzan û hevalên xwe (2023, 21) dibêjin ji ber bandora fikir û îdeolojiyan û kapasîteyên mirovan yên kognîtîfî di afirandin û nîrxandina zimanan de standardkirina zimên krîtîk e. Standardîzasyon bi gelemperî hinek tiştan vedîşere û zimanekî hevpar derdixe. Êdî zarava yan jî devok wenda dibin û zimanekî hevpar derdikeve. Herwiha varyasyon jî peyvek gelek berfireh e û wataya guherîna di nav xwe de dihevine. Di vê pêvajoyê de, gelek kes forma standardkirî wekî forma rast qebûl dikin lê ji ber cudahiyan zaravayan ew dikarin rastî biçûkdîtin an jî henekê kesan jî bên. Lê ji ber ku ziman dînamîk û candar e ew zimanê ku hatiye standardkirin mumkin e ku biguhere. Wê demê pirseke nû derdikeve holê. Zimanê rast çi ye? Zimanê rast kîjan e û kî bi kar tîne?

Ji ber ku standarîzasyon di destpêkê de nivîskî pêk tê hinek taybetmendiyan zimên yên peyvkî, morfolojîk û sentaktîk divê li gorî rêgezan bên qeydkirin. Li gorî Hudsonî (1996, 33), zarava yan jî devoka ku hatiye hîlbijartin di gelek qadan de têne bikaranîn û fonksiyonên girêdayî dewletê wekî hukuk, perwerde, tendurîstî û li tiştên nivîskî û medyayê de pir tînin bikaranîn. Ji ber ku ev cure dibe cureya civatê û di demêke dirêj de dibe zimanê netewî yê wî welatî, ev cureya navborî divê ji aliyê civakê ve bê qebûlîkirin. Eger zimanê ku hatiye qebûlîkirin ji aliyê gelek kesan ve neyê famkirin û cureyek cuda be, dê gelek pîrsgîrêk derkevin pêşberî biryargiran.

Holmes (2001, 76) îfade dike ku cureya zimanê standard bi gelemperî zimanê nivîskî ye û heya astekê guherîna rêzik û kodan di nivîsê de tê dîtin. Yanî teqez zimanê standard zimanê nivîskî ye û pîranî ji zimanê axaftinê rasttir

2 Hinek zimanên kêmaran li Tirkîyeyê zimanê ibihî (Ibîhça/tr) wenda bûye. Di lêkolînên li ser zimanên di xetereyê de, gelek caran tê nîqaşkirin ku zimanê ibihî (ISO-639-3: uby; Glottolog: uby1235), zimanekî ji koma bakurrojavayê Qafqasyayê ye (Akkuş, 2021: 159). Bi mirina axaftvanê xwe yê dawî Tefîk Esenç, di sala 1992an de ku li Balikesirê miriye tu axiverên vî zimanî nemaye. Herweha, *tirkiya Stenbolê* wekî tirkîya resen tê qebûlîkirin û tirkîya herêmên din di medyaya tirkan de wekî zaravayên lokal tên dîtin û di gelek filîman de jî devoka behra reş û herêma rojhilat û başûrrojilatê wekî kêmbûna rewşa feqîrbûn û cudahiya sosyopolîtîkê tê dîtin.

tê qebûlîkirin û formên axaftinê tên redkirin. Joseph (1987, 19) amaje pê kiriye ku zimanê standard ‘bi *hînkirin, rastkirin, teqlîd, asîmîlasyon, çandîbûnê (acculturation)*- tam bi awayên ku zaravayê zikmakî nayê wergirtin hatiye wergirtin. Wekî ku li jor hatiye behskirin, helbet ev bi zimanê nivîskî pêk tê. Li gorî Tharu (2023, 47) rewşa standardîzasyonê wiha ye: Wiha dixuye ku pêvajoya standardkirinê hema hema di hemû zimanên sereke de yên ku li çar aliyê cihanê tene axaftin zû yan dereng pêk tê. Ew kiryar di nava zimên bi xwe di yekkirina normên zimanan de cih digire. Eger pêk neyê her ziman her gav di bin xetereya bandora hemû zimanên sereke de ne. Mirov dikare rola kovara *Hawarê* û bandora wê li ser civakê di hawirdoreke taybet û awarte de weke bêhempa binirxîne. Lewma rola *Hawarê* gelek berfireh e. Taybetiya rewşenbiriya kurdî bi *Hawarê* re xuya kir û pê re jî hin bi hin formê xwe di kirasekî neteweyî de diyar kir. Lewre em dikarin bibêjin ku *Hawar* bû damezrînera bingeîn di rewşenberiya kurdî ya nivîskî de (Mehmûd, B. 2008, 126-128). Kovar bi xwe bû sedema qebûlîkirina alfabeya latînî û bi awayeke xwezayî hatiye qebûlîkirin û gelek biryarên wê demê hatine girtin (hinek rêgez wekî nivîsandina “lêkerên nerênî” nehatiye girtin) bi awayekî berbelav jî bûye standardîzasyona kurmançî. Herçiqas norma *Hawarê* ya destpêkê be jî, dîsa hinek form bi tevahî nehatine qebûlîkirin, hinek form bi awayeke berbelav cihê xwe girtiye û tê bikaranîn. Keskin (2018, 36) giringiya kovarê wiha îfade dike: “Piştî kovara *Jînê*, di nav kovarên kurdî de ya herî bibandor kovara *Hawarê* ye ku di sala 1932an de dest bi weşanê kiriye û heta 1943an jî dewam kiriye. Kovar heta îro jî wek bingeha rastnivîs û gramera kurdiya latînî tê dîtin”. Reşitoğlu di gotara xwe ya bi navê “*Normên Rastnivîsîna Hawarê*” de li ser vê mijarê fikirên xwe wiha îfade dike;

Digel ku em dikarin rastî mijarên rêzimanê bîn, di Hawarê de mijarên taybetî yên rastnivîsînê tune ne. Ji alfabe-yê heta navên taybetî, di bikaranîna peyv, hejmar, dîrok, daçekan û hwd. de mirov dikare rastî çend cureyan bê. Lewre di her hejmarekê de hem ji ber taybetmendîya nivîsandina nivîskarên cuda hem jî ji ber nedanîna normeke rastnivîsînê, mirov nikare normeke tekûz bibîne.

Wekî bi mînakên jor hate ravekirin, pêvajoya standardkirinê de qaîde û rêgez carekê de naguherin, di deme de cihê xwe digire û berbelav dibe. Loma mirov dikare rastî cudahiyan bikaranîna zimên bîn.

2. Hewldanên Berê Ji Bo Standardkirina Kurmançî

Hewldanên standardkirina kurmançî ji ber faktorên siyasî, çandî û civakî xwedî dîrokeke tevlihev e. Li ser hewldanên şexsî û kolektîf wekî sazî Toprak (2022, 55 - 139) di teza xwe bi navê *Serboriya Hewldanên Standardkirina Kurdiya Kurmançî li Tirkîyeyê (Ji Kovara Hawarê Heta 2022yan)* bi hûrgilî behsa wan dike û ji xebatên dezgehî wekî şano, medya, kovar, weşanxane, rojname, sînema, TV û internetê dinirxîne. Di ser re “saziyên sîvîl ên zimanî” û “saziyên fermî yên zimanî” jî dide ber hev û behsa kar û xebatên wan dike. Armanca van hewldanan yekkirina zaravayên cuda û afirandina çarçoveyeke hevîgirtî ya zimanî ye. Hewldanên giring ji bo standardkirina kurmançî heya niha bi giştî wiha ne;

2.1. Hewldanên destpêka sedsala 20an

Hewldanên standardkirina zimanê kurdî berî sedsala 20an dest pê dike ku mirov dikare ji rojnameya *Kurdîstanê* dest bi avakirina zimanekî bike. Destpêka rojnameyê girêdayî hilbijirtina zaravayê ye. Aydoğan (2023, 23) ev kesên ku di rojnameyê de kar kirine wiha dide;

Em heman helwêsta gazindên ji ber rewşa nexwendebûna Kurdan di nivîsên Miqdad Mîthet Bedirxan (Kurdistan) û Evdirehman Bedirxan (Kurdistan) û Seîdê Kurdî (Şark ve Kurdistan, KTTG), Abdullah Cewdet (Rojî Kurd), Babanzade İsmail Hakki (Rojî Kurd), Hemzeyê Muksî (Jîn) de jî dibînin, ku mirov dikare hişyariya rewşenbîrên kurd û hewla wan ya hişyarkirina milletî tê de bibîne.

Di kovara *Rojî Kurd* (1913) de, em rastî hewldanên xebatên alfabe û zimên tên (Dilgeş, 2012, 53; Aktaş û Yonat, 2013, 54; Kurt, 2021, 266). Di kovarê de, Abdullah Cevdet, Sûleymaniyelî Mesud, Xelîl Xeyalî bi giştî behsa guherîna alfabe-yê dikin û pêwîstiya guherînê dikin (Dilgeş, 2012, 54). Piştî hingê, yekem hewldanên sistematîk ên standardkirina kurmançî dest pê kirin. Rewşenbîr û nivîskarên wek Celadet Alî Bedirxan di nav salên 1932 û 1943yan de roleke sereke lîstin. Bedirxan di sala 1932an de kovara *Hawarê* damezirand û *Hawar* jî bû bingehek ji bo xebatên standardkirinê.

Yek ji xebatên standardkirinê yên herî berbiçav jî qebûlîkirin û bikaranîna alfabeya latînî ya kurmançî bû. Ev biryar bi giranî biryara Celadet Bedirxanî bû û hevdemên wî jî di kovarê de alîkariya wî kirin. Hevalên wî di wê baweriyê de bûn ku tîpên latînî ji bo temsîlkirina fonetîka kurdî jî tîpên erebî guncawtir bûn. Ev tevger di kovara *Hawarê* de fermî

bû û bi awayekî giring şikil da bipêşveçûna kurmanciya nivîskî ya kurdî. Bedirxan di nivîsa *Sê Tarîxên Hawarê* de, li ser her sê hêmanên bîngehîn yê ziman xwe wiha îfade dike: “*Hîmê zimanekî, li ser sê hêmanên bîngehîn sekiniye. Elfabe, rêziman û ferheng. Elfabe hate çêkirin, rêziman dest pê dike, li pey jî ferheng e*” (h.27, 5). Ji hejmara ewil û pê de, di kovara *Hawarê* de beşek bi navê “ferhengokê” heye. Di her hejmarê de, C. Bedirxanî ferhengok amade kiriye, pênasayên peyvên bi kurmancî şirove kirine, carinan mînak dane û dem bi dem jî beramberê peyvên kurmancî bi fransî nivîsiye. Carinan peyvên herêmî carinan jî peyvên kevnar bi kar anîne. Bi saya ferhengokê em peyveke herêmî³ hîn dibin û îro jî em dizanin ev peyv hîna jî hem di jiyana rojane û di gelek xebatên folklorîk de cih digire. Herwiha bi saya ferhengokê em dikarin hem peyvên wê demê û hem jî mentalîte û felsefeya zimên ku wê demê hatiye bikaranîn bibînin. Ev bi xwe jî derfeta dîtina guherîna zimên bi peyvên wê demê dide me. Dema mirov xebatên ferhengokê jî dibîne ev bi xwe jî zanebûna wî ya hînkirina peyvên û bikaranîna zimên nîşanî me dide. Lê di vê pêvajoyê de rêyeke çawa dê ji bo nivîsandina ferhengê baş bibûya? Metoda ku C. Bedirxanî (h.1, 2) di vê pêvajoyê de ji bo nivîsandinê hilbijartîye wiha ye:

- » *Berhevkirina peyvên* ku di jiyana rojane de di nav gel de tên bikaranîn.
- » Bikaranîna ew *peyvên xwemalî* yê ku di zaravayên kurdî yê din de hene.
- » Ji nû ve *vejîna peyvên ku di kurdî de hene*, lê di dewsa wan de peyvên biyanî tên bikaranîn.
- » *Derxistina peyvên xwemalî*, yê ku di nav çîrok, pêkenok, helbest, stran û zargotina gel de tên bikaranîn.
- » *Çêkirina peyvên nû*.

Celadet Alî Bedirxan (h.3, 4) ji bo giringiya alfabeyê fikirên xwe wiha îfade dike; “*Yekbûna Kurdan jî bi yekîtiya zmanê kurdî çê dibe. Yekîtiya zmanî jî bi yekîtiya herfan dest pê dike*. Rê û rêbazên ku wî hilbijartine, nêzîkatiya wî ya xebata standardkirinê nîşan dide. Wekî em dizanin Celadet Bedirxan û Reşîdê Kurd (Omer, 2012, 80) heya astekê standardek anîn rêzimanê. Di heman demê de, Tewfîq Wehbî ji bo soranî alfabeya latînî çêkir herwiha wî alfabeya îngilîzî wekî referans girtibû (Omer, 2012, 80). Wehbî devoka Silêmaniyeyê ji xwe re hilbijartibû. Bandora biryara wî hêj jî tê dîtîn. Piştî Wehbî, ji bo xebatên standardîzasyona soranî Îzeddîn Mistefa jî wekî kesê duyem tê qebûl kirin ku xebatên standardkirinê kirine (Omer, 2012, 81). Pêvajoya standardkirina soranî û kurmancî di demên nêzî hev de pêk tên. Herçiqas mirov dikare yekîtiya yan jî nêzîkkirina zaravayan bixwazê jî pêvajoya wan ji hev cihê pêk hatine. Berî wan jî cemiyetên Stenbolê hewl didin ku derbasî alfabeya latînî bibin lê xebatên wan neçûbûn serî. Di vê pêvajoyê de, bi taybetî nivîsên Xelîl Xeyalî û M.S. Azîzî gelek balkêş in. Metnên xwendinê bi her du zaravayên sereke ên kurdî, anku bi kurmanjî û soranî hatine amadekirin. Di xebatên ewil ên plansazîya kurdî da divê cih û giringîya rewşenbîr û çalakvanekî taybet bête bibîranîn. Ew kes Xelîl Xeyalî Mûtîkî (1876-1926) ye ku hem di warê teorî û fikir hem jî di warê pratîka plansazîya zimanî bo kurdî da bi nivîs û xebatên xwe ve cihê xwe wergirtiye (Kurt, 2022, 162).

2.2. Bandora Sovyetê

Di salên 1920 û 1930an de, civatên kurdên Yekîtiya Sovyetê jî di warê standardkirinê de gavên giring avêtin. Di sala 1925an de, kongreya *Trans Qafqasya ya Kurd* pêk hat. Di vê konferansê de, biryara amadekirina alfabeyeke kurdî li gorî herfên latînî hate girtin. Ev kar jî aliyê Îsahak Marogûlov û Erebe Şemo hate kirin û ev alfabe li Gurcîstan û Ermenîstanê piştî sersala 1928an bû fermî û dibistan derbasî vê alfabeyê bûn û ev alfabe heya 1938an hate bikaranîn (Reşîd, 2012, 204). Hikûmeta Sovyetê ji bo geşedan û pêşdebirina perwerdeya zimanê kurdî û weşangeriyê piştgiri da, ev yek jî bû sedem ku pirtûkên dersê yê kurdî bûne amadekirin û bernamêyên zimanê kurdî werin danîn. Bi taybetî, ji kurdên li Ermenîstana Sovyetê nivîsa kirîlî hate xwestin ku bê bikaranîn. Armanca koma kurdên Sovyetê ew bû ku alfabeya kirîlî bi kurdî bi kar bînin. Di vê serdemê de, malzemeyên kurdî yê standardkirî hatin çêkirin, ku bandorê li rewşenbîrên kurd ên derveyî Yekîtiya Sovyetê kir. Wê demê gelek xebat bi alfabeya kirîlî hatine amadekirin û hewla çêkirina zimanê standard derketiye. Herçiqas zimanê standard derketibe jî ji ber ku ew di herêmeke sînorkirî de hate bikaranîn li herêmên din yê kurdîxav berbelav nebû.

2.3. Îraq û Herêma Xweser ya Kurdan (1970yan û heta niha)

Piştî salên 1970yan li Îraqê hinek şer û tevlihevî bû sedema avabûna Herêma Kurdan ya Otonom (derdora salên 1990) û Hikûmeta Herêma Kurdistanê ava bû. Vê hikûmetê hewl da ku di perwerdeyê de li gorî xwe dîzayn bike. Saziyek bi navê Akademiya Kurdî (*bi soranî*: ئه‌کادیمیای کوردی, *lat. Ekađîmyay Kurdî*) ava bû. Wekî beşek ji hewldanên avakirina neteweyê, avakirina Akademiya Kurdî, ku bi rêya pêşxistina rêbernameyên rêzimanî, rastnivîs û ferhengan

3 . Bo mînak peyva “boş” ê, di wataya “zêde, zehf” de niha li bajarên Şîrnex û Colamergê de tê bikaranîn.

di standardkirina zimên de roleke girîng lîst. Hikûmetê zimanê Kurdî wekî zimanekî fermî di perwerde û rêveberiya giştî de pejiran û hebûna wê çarçoveyên Zagonî pêş xist. Ev hewldanên hikûmetê çar qonaxên modela standardkirina Haugenî nîşan didin: Kurmancî wekî zaravayekî fermî hate hilbijartin, bi rêya çavkaniyên zimannasî yê birêkûpêk hate kodkirin, li seranserê platformên perwerdehî û medyayê hate berfirehkirin û hêdî hêdî ji hêla saziyan û raya giştî ve hate pejirandin. Zagonên Iraqê yê 2005an zimanê Kurdî wekî yek ji zimanên fermî yê welêt qebûl kir, ku ev yek gaveke girîng di qonaxa pejirandina pêvajoya standardkirinê de pêk hat.

2.4. Hewldanên Diasporayê (1970 û heta niha)

Herwiha bandora diasporayê divê neyê jibîrkin, mirov dikare vê pêvajoyê wekî *pêvajoya sirgûnê* jî binav bike. Gelek komên kurd wek siyasî û edebî li Awrûpayê bi cih bûn û kar û xebatên wan bi awayekî xwezayî pêvajoya standardîzasyona zimên pêş xistin. Gelek weşanxaneyên cihê, materyalên perwerdeyê û naverokên dersan bi taybetî bi alfabe ya latînî derxistin.

Enstîtuya Kurdî ya Parîsê, ku di sala 1983yan de hatiye damezrandin, di xebatên nûjen ên standardkirina kurmançî de gelek xebatên giring pêk anîne. Kovara *Kurmanciyê* derxistine. Enstîtuyê gelek xebatên li ser zimannasî, rêziman û rastnivîsa kurdî çap kirine. Di heman demê de bûye navendek ji bo çalakiyên çandî û akademîk ên kurdî, ku forma-ka standardkirî ya zimanî li qada navneteweyî pêşniyaz dike. Skutnabb-Kangas û Fernandes (2008) di gotara xwe de behsa tevkeriyên Enstîtuya Kurdî ya Parîsê di warê pîrrengî û mafên zimên de dike û balê dikişîne ser hewldanên wê yê standardkirina kurmançî û hewldanên wê yê çandî û akademîk. Ji îlona 1987an heta sala 2020an her şeş mehê carekê ji bo standardkirina kurmançî civînek pêk anîn. Ji bo her civînekê hejmarek dihate derxistin⁴. Ergûnî di teza xwe de xebatên *Koma Kurmanciyê* di bin sê kategoriyan giştî da dabeş kiriye (2024, 222):

- » 1. Mijarên teorîk ên li ser rêziman, rênivîs, etîmolojî û peywendiya zimanê kurdî di gel zimanên îranî û zimanên cîran,
- » 2. Ferhengsazî û çêkirina ferhengokan,
- » 3. Zaravesazî di qadên jiyana modern da.

Wekî tê dîtin rola Enstîtuya Kurdî ya Parîsê di kar û xebatên standardkirina zimên de mîna keke baş e. Du saziyên hevçerx, Komxebata Kurmançî bi navê *Semînera Kurmançî* û Komxebata Kîrmançî bi navê *Grûba Xebatê ya Vateyî*, ne navendên ku bandora mezin li plan û rêxistinê ya zimanê kurdî di diasporayê de hene (Akin, 2018, 191).

2.5. Hewldanên li Tirkîyeyê

Nifusa herî zêde ya kurdan li Tirkîyeyê ye. Ligel vê rastiyê heya salên 1990î kurdî û xebatên têkildarî kurdî qedexa bûn. Lewma jî xebatên ji bo standardîzasyona kurmançî mirov dikare bêje ku ji salên 1990î û pê de dest pê kirine. Ev yek jî bi rêya saziyên wek yê zimanê kurdî (komeleyên, sendîqa, weqf), çapemenî (*Rojnameya Azadiya Welat*) û weşanên kurdî (gelek qenalên TVyan) ji bo gav bi gav forma standardîzekirî ya kurmançî pêş bikeve xebitîn.

Coşkun (2004, 13) bi kurtahî pêvajoya standardîzasyonê wiha dide:

*Di vî warî de li Tirkîyeyê xebatên standardîzasyon û plansazîya zimanê kurdî, di serdema dawî ya Dewleta Osmanî de ji aliyê rewşenbîrên kurd û hinek sazîyan (Komeleya Hêvî, Komeleya Teavûn û Tereqî ya Kurd û hwd.) ve hatine meşandin. Bi hewldana Celadet Alî Bedîrxan û kadroya Hawarê, xebatên standardîzasyonê û plansazîya zimên zêde bûne. Di roja me de jî li Tirkîyeyê bi gelemperî bi destên sazîyên kurdî yê wekî Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Weqfa Mezopotamyayê Weqfa Nûbiharê, Enstîtuya Kurdî ya Amedê û hwd. xebatên wekî kursên zimanê kurdî, aktîvîteyên mafên zimên, weşan û çapemeniyê bi rê ve diçe. Di vî warî de **TZP** Kurdî jî heta 2016an xebatên xwe pêk anîne.*

Herwiha, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê gelek xebatên hêja pêk anîne, pirtûka rêzimanê (Samî Tan), Ferhenga Tirkî û Kurdî (Zana Farqînî) û rêzepirtûkên Hînkêrê (S. Tan-R Onen-S.Varlı-M.Aykoç) ji bo standardîzasyonê gelek bi-bandor in.

Di ser re, bandora TZP jî Önen (2020, 35) wiha îfade dike. “Bo berbelavkirina bikaranîna kurdî karê herî mezin ku hat kirin hînkirina kurdî bû. TZP Kurdî li KURDÎDER’ên ku li gelek bajar û bajarokan hatibûn avakirin dursa hînkirina kurdî da bi hezaran xwendekaran”.

4 https://archive.org/details/kovara_kurmanci/ku1/

Niha li Tirkiyeyê hewldana herî mezin ji bo standardkirina zimên ji aliyê Weqfa Mezopotamyayê tê kirin. Wekî ku Bahoz Baran⁵ agahî dide; weqf di sala 2013an de bi mebesta avakirina zanîngehekê hat avakirin. Di serî de armanç amadekirina materyalên dersan bû. Dawiyê xebatên cuda pêk hatin. Ji bo biryardayîna li ser mijaran jî hinek rêbaz hatin diyarkirin. *Berbelavî, tradîsyon, nêzîkkirina zaravayan, jêderên zimanî* û hwd hin ji wan rêbazan bûn. Bi diyarkirina rêbazên navborî biryar hatin dayîn. Wekî ku Baran jî îfade dike li ser xebata rastnivîsînê gelek rexne derketin. Hinek rexne li ser pergala rêbaz û etîkê ya komxebata *Kurmanciyê*, hinek jî li ser naveroka *Rêbera Rastnivîsînê*⁶ bûn. *Rêbera rastnivîsînê* ji aliyê 18⁷ kesan ve hatiye amadekirin. Hejmara endamên nûneran ne wek hev in. Ji Bakur 9, ji Başûr 5, ji Rojhilat 3 û ji Rojava 1 kes (Aydın, 2020, 139).

Wekî tê zanîn hinek rexne li ser *Rêbera Rastnivîsînê* derdikevin. Yên ku Aydın (2020, 140) di gotara xwe de dane wiha ne:

1. Nevzat Emînoğlu, “Xebateke Girîng û Dîrokî: *Rêbera Rastnivîsînê*”, Nûbihar, 147, Bihar 2019, rr. 40-43.
2. Amed Tîgrîs, “Çend başî û şaşiyên *Rêbera Rastnivîsînê* Komxebata *Kurmanciyê*”, <http://www.rojnameyakurdistan.com>, (02.04.2019)
3. Deham Ebdulfettah, “Daxuyaniyek Di Derbarê *Rêbera Rastnivîsînê* Da”, <http://portal.netewe.com/daxuyaniyek-di-derbare-rebera-rastnivisine-da/>, (30 Temmuz 2019)
4. Maruf Yilmaz, “Hizrek li ser pirtûka “*Rêbera Rastnivîsînê*” ya “Komxebata “*Kurmanciyê*”, <http://www.rupelanu.com/hizrek-li-ser-pirtuka-rebera-rastnivisineya-komxebata-kurmanciyê-4974h.htm> (16 Gulan 2019)
5. Qasim Xelîl, “6 rexne li “*Rêbera Rastnivîsînê*”, <https://www.bernamegeh.org/2020/02/12/6-rexne-li-rebera-rastnivisine/>
6. Husein Muhammed “*Rêbera Rastnivîsînê*” ya WM û derdê giran yê hîperkorektîyê û xweferzkirinê (1)”, (Jan. 29, 2020)
7. Remzî Kerîm, “*Rêbera Rastnivîsînê*: munaqêşe yan pêşbirke?”, https://remzikerim.wordpress.com/2020/02/16/_trashed/ (Feb. 16. 2020)
8. Saziya Zimanê Kurdî, “Ji bo Weqfa Mezopotamyayê\Komxebata *Kurmanciyê*: Encamnameya nîqaşên li ser *Rêbera Rastnivîsînê*” (22.12.2019)
9. Halil Aktuğ, Gotara *Rastnivîsa Kurdî* (Kurmancî).
10. Yaşar Eroğlu, “*Rêbera Rastnivîsînê* çî rast nivîsiye?”, Nûbihar, 149, Payîz 2019, rr. 42-49.

Ji bilî van, ev rexneyên jêr jî hene, xebatên cuda ku hatine tespîtîkirin wekî gotar, hevpeyvîn, tez û nivîsên medyaya civakî ne:

- » Necat Keskin, *Ji Aliyê Rêbaz û Etîka Zanistî ve Rexneyek li ser *Rêbera Rastnivîsînê* ya Komxebata *Kurmanciyê** <http://www.ijoks.com/en/pub/issue/75554/1234239>
- » Ergîn Opengîn⁸, *Pêdaçûneke Rexneyî li ser “*Rêbera Rastnivîsînê*”*, <https://zimannas.wordpress.com/2020/02/22/pedacuneke-rexneyi-li-ser-rebera-rastnivisine/>
- » Qahir Bateyî⁹, Ez deyndarê zimanê xwe me, 1 Sibat 2021, <https://xwebun2.org/nu-ez-deyndare-zimane-xwe-me/>
- » Özmen A., (2019) *Berawirdkirina sê Berhemên Rastnivîsîna Kurmancî (Bingehên Rastnivîsîna Kurdîyê ya Arîf Zêrevan -Rêbera Rastnivîsînê ya Mistefa Aydoğan- Rêbera Rastnivîsînê ya Komxebata *Kurmanciyê*) / Arîf Zêrevan 'ın Kürtçe Kurmancî Lehçesinin Yazım Temelleri ve Mistefa Aydoğan ile Mezopotamya Vakfı İmla Kılavuzları Eserlerinin karşılaştırılması*, Teza çapnebûyî, Şêwirmend Doç.Dr. Mustafa Öztürk, Zanîngeha Mardin Artukluyê.

5 <https://bahozbaran.wordpress.com/2020/02/13/weqfa-mezopotamyaye-xebaten-zimani-u-komxebata-kurmanciyê/>

6 Berî rêbera rastnivîsînê, A. Zêrevan, M. Aydoğan, Halil Aktuğ, xebatên di dawîya rêzimanên Samî Tan û Kadri Yıldırım beşên rastnivîsînê hene.

7 Di listeya lijneyê da ev her çar parçe bi “Başûr, Bakur, Rojhilat û Rojava” yê hatine binavkirin. Endamên lijneyê ev in: Bahîz Omer Ehmed (Başûr) Bahoz Baran (Bakur), Behrûz Şucaî (Rojhilat), Deham Evdîlfeţah (Rojava), Dilawer Zeraq (Bakur), Dilbîrîn Evdîla (Başûr) Evdîlwehab Xalid Mûsa (Başûr), M. Malmisaniy (Bakur), Mahmûd Lewendî (Bakur), Mehdî Caferzade (Rojhilat), Mihemed Teqewî (Rojhilat), Mistefa Aydoğan (Bakur), Mîkaîl Bilbil (Bakur), Newzad Hîrorî (Başûr), Samî Tan (Bakur), Şoreşvan Adil (Başûr), Zana Farqînî (Bakur), Zulkuf Ergun (Bakur)

8 Nişeya malperê: Gotara Ergin Öpengînî di sala 2017an de di kovara *Derwazeyê* di hejmara 1ê de derketibû. Nivîsar li ser *Rêbera Rastnivîsînê* ya Mistefa Aydoğan nivîsî ye û hatiye nivîsîn berî ku heman kitêb bi navê weqfa Mezopotamyayê û navê nêzîkî 20 kesan dubare were weşandin. Mixabin di çapa nû jî ya *Rêbera Rastnivîsînê* de nêrînên Öpengînî – wek nêrînên rexneyî yê piraniya zimannas û şarezayên din jî hatine piştguhkirin.

9 Qahir Bateyî di nivîsa xwe de li ser rewşa rastnivîsînê tu nav nade lê bi awayekî zelal rexneyên xwe li hemberî Weqfa Mezopotamyayê û weşanxaneyên ku di vê pêvajoyê de biryarên nû girtine tine zimên.

» Aydoğan¹⁰, I.S. di medyaya civakî de rexneyên xwe ifade dike.

Mijarên ku bi giştî hatine rexnekirin¹¹ wiha ne:

» “î” û “ê”ya berî “y” yê

» “r” ya stûr

» Apostrof

» Bazinedaçek

» Bikaranîna peyvên biyanî

» Bêjeyên erebî ku di kîteya wan a dawiyê de “î” heye

» Hejmar

» Navên bajaran

» Navên mehan

» Navên parçeyên Kurdistanê

» Navên rojan

» Navên welatan

» Nivîsîna cihnavên hevbendiyê

» Nivîsîna zimanan

» Partîkela dema bê

» Rewşa tebat, bikaranîna lêkera “hatinê

» Rêzkirina hejmaran

» Tesnîfa lêkeran

» Tewang

» Tîpên kelijandinê / gihandinê

» veqetandek

» Veqetandekên nebinavkirî

Nîqaşa duyemîn ji meseleya rêbaz û etîkê ye. Li ser vê Keskinî (2023) gotareke nivîsiye û xebata *Rêbera Rastnivîsînê* ya *Komxebata Kurmanciyê* ji her du aliyên ve rexne kiriye.

2.6. Hewildanên dijîtal û online

Çavkaniyên dijîtal gelek hewildanên mezin ji bo standardîzasyona zimên çêdikin. Çavkaniyên wekî ferhengên online, kursên zimên, vîdyoyên zimên li ser medyaya civakî, kutupxane, rojname, pirtûk û nivîsên dijîtal li ser berbelavkirin û qebûlkirina formên standard yên zimên vê rewşê ber bi asteke bilindtir ve dibe. Ji ber vê hinde, sazî çiqas bi hev re bixebitin, dê ew ê di vê pêvajoyê de zûtir yekitiya zimên bi dest bixin. Lewra, înternet dikare kare standarkirina kurdî hêsantir bike û ji bo bikaranîna kurmancî derfetên nû derxe holê. Platformên online, medyaya civakî û weşanên dijîtal alîkarî da ku di nav kurdîaxivan de li seranserê cîhanê hevkarîyeke mezintir çêbibe. Hewildanên dijîtal parvekirina materyalên standarkirî û pêşvebirina formeke zimanî ya yekbûyî hêsantir kir. Sheyholislamî (2010, 298-305) bandora platformên medyaya civakî yên li ser pêvajoya standarkirina kurmancî dinirxîne û me agahdar dike ku çawa van platforman hevkarîya di navbera kurdîaxivan de û berbelavkirina zimanêke standardekirî hêsan kiriye. Biryareke giring li ser bandora internet û medyayê ya *Konferansa Zanistî ya Zimanê Kurdî* ku di sala 2011an de pêk hatibû biryara 9 û 10an bû¹²

10 Rexneyên wî li ser rêbaz/etîkê û li ser “fonetik, rastnivîsa hinek peyvên û hinek mijarên rêzimanê ne (bo mînak: î’ya berê y’yê, ezafe, pirjimarî apostrof, şedde û hwd).

11 Ev mijarên jor ji aliyê Bahoza Baranî ve hatiye derxistin û li cihekî nehatiye weşandin.

12 https://ku.wikipedia.org/wiki/Konferansa_Zanist%C3%AE_ya_Ziman%C3%AA_Kurd%C3%AE_2011

9. Zimanê kurdî mîna zimanên din di warên teknoloji û torên internetê de kar pê bê kirin.

10. Medyayên kurdî bernameyên taybet bi zimanî ve û bi herdu alfabeyan amade û pêşkêş bikin bi mercekî ku rênivîsên wan yek bixin.

Biryarên bi vî rengî haydarbûna civakê zêde dike û bi demê re, rê dide mirovan ku di torên internetê û medyayên civakî de pir bîne bikaranîn. Ji ber giringiya vê, Yıldız (2005, 122-145) behsa bandora pîrsgirêkên siyasî li ser standardîzasyonê kurdî û pêşketina zimanî û medyayê dike. Herwiha Zeydanlıoğlu (2012, 166) jî di gotara xwe de îdîa dike ku astengiyên siyasî hene lê medyaya kurdî û weşangerî alikariya standardîzasyonê dike. Di warê afirandina zimên de, gelek xebat hene û têne çapkirin, lê herwiha di warê veguhestina (transfêra) zimên de pîrsgirêkek heye ku rêjeya transferê gelek kêmtir e û di navbera nîşan de ziman bi awayekî berfireh neqlî nîşanê nû nabe. Loma teknoloji dikare bikêr be û transfêra zimên pêk bîne.

Ev tabloya li jêr hewldanên standardkirina kurmançî li gorî modela Haugenî (hîlbijartin, kodkirin, berfirehkirin, qebûlkirin) nîşan dide:

Pêvajoyê	Ravekirin	Mînak
Hîlbijartin	Hîlbijartina zarava yan formeke zimanê ku dê standard be	- Rojnameya <i>Kurdistan</i> - Celadet Bedirxan û kovara <i>Hawarê</i> Destnîşankirina tîpên latînî li Sovyetê
Kodkirin	Kodkirina rêziman, rastnivîs û ferhengên (kaîde û rêgezên zimanî)	- Afirandina alfabeya latînî ya Celadet Bedirxanî - Beşên <i>Ferhengokê</i> di <i>Hawar</i> de û Ferhengên cihê - <i>Rêbera Rastnivîsînê</i> ya Weqfa Mezopotamyayê Pirtûkên Rêzimanê (C.A. Bedirxan, Samî Tan, Mikail Bilbil, Bahoz Baran, Çetîn Taş û hwd.)
Berfirehkirin	Pêşxistina zimanê standard di qadên nû de (perwerde, medya, akademiya)	- Xebatên Enstîtuya Kurdî ya Parîsê - Komeleyên diasporayê, nivîskar û medya - Ferhengên dijîtal, vîdyo û kursên online
Qebûlkirin	Pejirandina zimanê standard ji aliyê civakê yan rêxistinên fermî ve	- Dersên bijarte (hîlbijartî) li dibistanên MEBê - Medya, rojname û TV bi kurmançî

3. Armanç û Pîrsgirêkên Standardkirina Kurmançî

Armanca standardkirina kurmançî geşedan û pêşketineke mezin di qadên zimannasî, çandî, siyasî û bi taybetî di perwerdeyê de ye. Jixwe bi saya standardîzasyonê yekitiya qadan çêdibe.

3.1. Armanca standardîzasyonê bi giştî wiha ye;

- » **Parastin û vejîna zimên:** Ev armanca sereke ye ku zimaneke hevpar derkeve û bi giştî bê bikaranîn. Ji ber vê însan dê bikarin bi heman awayî zimanê xwe bi kar bînin. Dema zimanek ku bi awayekî nivîskî bê qeydkirin, wê demê parastin û vejîna wê jî zêdetir bibe. Wendabûna zimanekî di heman demê de tê wataya wendabûna çand û kodên civakî ku di nav xwe de dihevin. Bi vê mebestê, divê sazî xebatên dokumantasyonê wekî çêkirina ferhangan, qeydkirina deng û nivîsê pêk bînin. Hassanpour (1997, 98) dibêje ku rola zimên di avakirina netewebûn û nasnameyê de gelek giring e û parastin û standardkirina zaravayan ji bona berdehemîya mîrasa çandî jêner e. Lewma li vir pîrsgirêk ev e ku derfetên qeydkirin û nivîsê şexsî ne. Mîrov dikarin li ba xwe û li ser medyaya civakî yanî di internetê de korpûseke şexsî ava bikin. Herwiha hebûn û bikaranîna teknolojiyê jî di parastin û vejîna zimên de ji ber berbelavkirina materyalan roleke gelek giring dilîze. Ji ber vê sedemê, dixwazî saziyên fermî hebin an tunebin, hewldanên bikaranîna teknolojiyê vê pêvajoyê xurt dikin.
- » **Peşveçûna Perwerdeyê:** Hêsanîkirina perwerdeyê bi saya zimanê standard pêk tê û ev jî di nav xwe de hînbûn û hînkirina zimanekî pêwîst dike. Çêkirina mufredateke standard û materyalên perwerdeyê hînbûn, hînkirin û bikaranîna zimên hêsanîtir dike. Bi saya zimanekî hevpar hemû xwendekar digel ku ji deverên cihê jî bin, marûzî heman bernameyê dimînin û heman nêrîn hiş û mentîqa zimên di hînbûna pratîkê de çêdibe. Herçiqas cudahiya zarava û hêmanên çandî û zimên hebin jî, bi saya zimanê standard dê famkirineke giştî pêk were. Ev rewşa navborî jî ber hîlbijartin û bikaranîna heman materyalî ji bo mamoste û hîndebaran jî rehetîyeke mezin e. Dê xwendekar û fêrxwaz jî ji ber nasîna materyalên di asta bariyerên hînbûnê de xwe di nav asteke kontrolkirî û rehet de bibînin. Ji

aliyekî din jî dema zîmaneke standard hebe û materyalên giştî bêne bikaranîn wê demê hemû xwendekar marûzî heman perwerdeyê bimînin û cudahiyên wekî sosyo-ekonomîk an jî derfetên cuda dê wenda bibin û ev rewş dê wekhevîya perwerdeyê bide hemû xwendekaran. Thomas, W.P., û Collier, V.P., (1997, 38) behsa xwendekarên ku perwerdeya xwe di zîmanê standard¹³ te girtine dike û dibêje geşedana wan a kognîtîfî û serkeftina akademîk gelek çêtir e. Tunebûna perwerdeya standardîze û mufredatê pêşxistin û geşedana zîmanê dikare bi paş bixe û di nav hinek herêmên cuda de newekhevî derkeve. Bi giştî alfabe û termînolojî wekî mînak perwerdeya fermî bi kurdî û zaravayan li Başûr û Rojava heye lê li Bakur û Rojhilatê tune ye. Bikaranîna pirtûkên mina *Hînger*, *Mamoste* û *Kurdîzanê* perwerdeyê pêşve dixe.

» **Yekitiya Çandî û Avakirina Nasnameyê:** Kurd wekî tê zanîn ji aliyê zarava, dîn û hinek tiştên çandî ve ji hev cihê ne. Bi giştî çand, dîn, zîman û zaravayên cuda di nav kurdan de gelek berbelav in. Wekî tê zanîn kurdên elewî, mesihî, misliman û êzîdî hene. Herwiha ev cudahî bi xwe re cudahiyan jî tîne. Lewma hebûna zîmanê standard dikare bi hêsanî yekitiya civakê, nasîna nasnameyeke hevpar û têgihiştina cudahiyan jî bi xwe re bîne. Rola zîmanê standard jî wekî yekkirina cudahiyên zarava û herêmên cuda ye.

Ji bo yekitiya giştî zîmanê standard wekî amrazeke bihêz dikare çanda hevpar û nasnameya netewî bi taybetî bi zîmanê re derkeve. Hassanpourî (2003) di gotara xwe de ev xala navborî jî ber berbelavbûna kurdan li herêmên cuda ji bo avakirina nasnameyê wekî amrazeke alîkar dinirxîne. Li dinyayê di sedsalên berê de “yek netewe, yek zîman” sloganeke gelek populer û bibandor bû. Gelek welat pêşxistina zîmanê neteweyî wekî sembola yekîtiya netewebûnê dîdîtin (Holmes, 1990, 100).

Wekî mînak li Tanzanyayê, ku li wir gelek zîmanên herêmî hene hîlbijartina zîmanê swahîlî bû sedema yekîtiya netewî. Holmes (1990, 103) me agahdar dike ku yekem serokê Tanzanyayê Julius Nyerere, *zîmanek ji malbata zîmanê bantu zîmanê swahîlî* jî ber sedemên perwerdehî û îdeolojîk hîlbijartîye.

Geşedena edebî, medya û hunerî: Ji bo pêşxistin û berbelavkirina edebiyat, medya û hunera kurdî hebûna zîmanê standard alîkariyeke bihêz dide her kesi. Bi vî şêklî asta afirineriyê, îfadeya edebî û hunerî zêde dibe ji ber ku dema zîmanek standard be, wê demê nivîskar, helbestvan, rojnamevan an jî akademîsyen jî dikarin bi zîmanê standard bigihîjin gelek kesan û bêne famkirin. Em di kovara *Hawarê* de dibînin zîmanekî standard çawa ne tenê di beşên navborî de lê di werger, dîrok û qadên din de jî zîmanek bi saya wergerê jî nû ve xwe geş dike. Dema zîmanê ku hatiye hîlbijartin wekî hev be, ev jî bo gel dibe sedema ragihandin û afirandina rehetir û zêdetir. Niha ji ber tevliheviya standardên cuda, em dibînin ku hinek kesên ku li ser rêzîmanê dixebitin wekî “polîsên rêzîmanê” xuya dikin. Herwiha bi awayekî preskriptîf (rêgezperstî/qaîdeperest) mudaxeleyên axaftin û nivîsina kesên din dikin (Milroy, 1999, 13). Lê dema standardeke hevgirtî hebe, pîrsgîrêkên bi vî rengî jî dê kêmtir bibin. Di ser re, dê her daîm varyasyon hebin û hebûna edebî, medya û hunerî jî dê varyasyonan biparêzin.

Di çapemenî û edebiyatê de, hebûna bisînor a kurmançî dikare pêvajoya standardbûnê hê zêdetir sist bike. Zîmaneke standardkirî bi taybetî bi pirtûk, rojname û naveroka online’ê jî hêla wêjeyêke dewlemend ve piştgiriyeke mezin digire. Gelek platformên medyaya civakî hem wekî video hem jî wekî nivîs gelek tiştan parve dikin. Bo mînak, gelek kes jî bajar û navçeyên cuda bi video û parvekirinên kurdî xwe digihînin hezaran.

» **Nasîn û qebûlkirina siyasî û ya fermî:** Ji bo zîmanên kêmaran (kêmnîyet; minority) û civakên ku bi wan diaxivin, bîdestxistina naskirina siyasî û fermî bi rêya standardkirina zîmanê pêvajoyek e krîtîk e û ev pêvajoyê jî bo wan hêsanî dibe. Standardbûn jî bo têkelkirina zîmanekî di bikaranîna fermî (di warên qanûnî û siyasî de) de jî bo ku bê nasîn pêdivîyeke mecbûrî ye. Ev naskirin jî bo ku zîman û axiverên wî di çarçoveyêke firehtir ya neteweyî û navneteweyî de maf û îmkânên wekhev wergirin pêvajoyêke pir giring e. Li Başûr û Rojava, êdî di pratîkê de jî ber nasîna siyasî sazî dikarin zîmanekî standard bi kar bînin û perwerdeya xwe bi vî awayî bidin. Ji ber vê rewşa heyî êdî perwerde û jiyana rojane di cih û warên wekî kar, malbat, camî, bazîrganî rêjeya bikaranîna zîmanê bi pêş dikeve. Ji bo ku zîman di belgîyên fermî, tekstên qanûnî û têkiliyên hikûmetê de were bikaranîn, ev kodkirin pêwîst e. Herwiha dema ku zîmanek standard be û bi qanûnî were naskirin, ew dikare di rêveberiya giştî, pergala dadwerî û sazîyên perwerdeyê de jî were bikaranîn. Di ser re, ev bikaranîn tevlêbûna gelî pêş dixe û destnîşan dike ku axiverên zîmanê dikarin bigihîjin karûbarên bîngehî û bi tevahî beşdarî jiyana giştî bibin.

Naskirina siyasî û yasayî ya zîmanekî standardkirî jî bo parastina mafên zîmanê yên civakên kêmar jî dibe alîkar. Bi dayîna statûyêke fermî ya ku bikaranîn û parastina wê ferz dike, dikare pêşî li marjînalbûn û qelsbûna zîmanê bigire.

13 Li ser giringiya bikaranîna zîmanê zîkmakî gelek xebat hene yek ji wan ku gelek li ser perwerdeya bi zîmanê zîkmakî û pêwîstiya zîmanê standardîzekirine ya Skutnabb-Kangas, T. û McCarty, T.L. (2008:158-162) ye. Ew dibêjin ku avantajên bikaranîna zîmanê zîkmakî gelek in û jî bo pêşxistina perspektîfên civakî, kognîtîf, perwerdehî û çandî kêrhatî ne.

Ev parastin gelek caran bi awayekî fermî dibe sedema pêşxistina zimên. Di belge û nivîsê de, bikaranîna zimanekî standard dê pêvajoya geşedan û xurtkirina zimên bi awayekî kontrolkirî bide me. Bo nimûne, li ser vê mijarê McDowall, D. (2004, 255-270) behsa şerên siyasî û rola standardîzasyonê di bidestxistina nasîna siyasî de dike ku ev çiqas wek perçeyeke giştî ye. Herweha mînakên dîrokî jî giringiya standardkirina zimên di bidestxistina naskirina siyasî û hiqûqî de nîşan didin. Ji bo nasîna zimên gelek hewldanên cuda pêk hatine. Bo mînak, vejîn û standardkirina îbranî li Îsraîlê dikare bê dayîn û roleke sereke di pêkhatina nasnameyê neteweyî û damezrandina îbranî wek zimanê fermî de list û bikaranîna zimên di hemû kar û barên dewletê de misoger kir. Elyezer Ben Yehuda pirî caran wekî bavê *îbraniya nûjen* tê hesibandin û wî di vejînê de roleke giring list. Hewldanên wî di nav wan de afirandina peyvên nû, weşandina ferhengên û parêzvaniya îbranî wek zimanê axaftinê yê gelê cihû de balkêş bû (Holmes, 1990, 109; Fellman, 1973). Di vejîna îbranî de, dema plansaziya zimên çekirin, çekirina rêziman û ferhengê jî xistin nav vê pêvajoyê. Politikayên perwerdeyê û akademyên zimên ji bona zimên di nav dibistan û civakê de pêş bikeve gelek xebat pêk anîn (Schwarzwald, 2001).

» **Rehetiya Ragihandinê:** Hêskirina ragihandinê û hevtêgihiştinê bi taybeti di civakên pirzimanî de armanceke giring a standardkirina zimanî ye. Standardkirina zimanekî cudahiyên zarava û herêmî kêmtir dike. Ev pêvajoyê hevgirtina civakê zêdetir dike, tevlihbûnê pêş dixê û piştgirî dide xebata bikêrhatî ya saziyên cihêreng ên civakê. Fishman (1972, 15-35) di beşa duyemîn de li ser zimanê standard agahî dide kur hebûna zimên ragihandin û entegrasyona perwerdeyê bihêztir dike.

Standardkirina zimên bi peydakirina platformeke hevpar ya ragihandinê û diyaloga navçandî teşwîq dike. Ew dihêle ku mirovên ji paşxaneyên cuda yên çandî û zimanî, raman, serpêhatî û perspektîfan parve bikin yanî bi awayekî xwezayî dibe sedema ji hev têgihiştin û rêzgirtinê. Ev diyalog jî bo ragihandina civakê pêvajoyê veguhestinê ye. Wekî mînaekeke giring, zimanê îngilîzî ji aliyê Crystalî (2003, 128) ve tê dayîn ku standardkirina îngilîzî ber ragihandina dinyayê diyaloga nav çandan vekirîye û gelek astengiyên ji holê rakirîye.

Di navbera cudahiyên zaravayan de, zimanê standard dikare ragihandinê hêsantir bike. Thomason, (2001, 74 - 85) îdîa dike ku bi saya zimanê standard em êdî dikarin astengiyên ragihandinê rakin û insanên ji zaravayên cuda dikarin bi rehetî ji hev fam bikin. Herweha, bi kurtî, di navbera zaravayan de, ya herî zêde tê axaftin kurmançî ye. Lewma varyasyonên zaravayan dikarin pêvajoya standardîzasyonê ji ber nîqaşên cuda tevlihevî bikin.

Bo mînak

Li Başûr hinek peyv bi awayekî tîn bilêvkin lê li bakûr an jî devereke din ji ber bandora zimanên din xwedî telafûzên cihê ne. Mînakên wiha dikarin di ragihandinê de bibin pîrsgirêk.

Tilikom – Telekom

Linin – Lenin (Scherco R. Baban, 2013)

» **Derfetên Aborî:** Pêşxistina geşedana aborî bi rêya standardkirina zimên bi afirandina çarçoveyek zimanî ya yekgirtî ve girêdayî ye ku danûstandin, bazirganî û entegrasyonê di navbera herêman de hêsantir dike. Zimanekî standardkirî bi hêskirina tîkilî, parvekirina agahdarî û hevkarîyê jî bo kes û karsazan dikare çalakiyên aborî bi giringî zêde bike. Piştî hevfamkirina hêsan û zêdetir, mirov bi rehetî dikarin bi deverên cuda re têkevin nav tîkiliyên aborî û dema ku ji zimanê hev bi rehetî fam bikin ew dikarin asta bazirganiyê zêdetir bikin. Xebata Coulmasî (1992, 89-105) li ser hevsengî, tîkiliya zimanê standard û geşedana ekonomîk disekine û digihîje wê encama ku hebûna zimên di entegrasyona ekonomîk û mezinbûnê de roleke mezin dilîze.

Standardkirina zimên di navbera komên cuda yên zimanî de dibe sedema kêmkirina astengiyên ragihandinê loma êdî bazirganî hêsantir dibe. Ev hêsanîya danûstendinê jî bo pêkanîna danûstendinên karsazî, peyman û gihîştina bazarên nû giring e. Di heman demê de, zimanekî standard di ragihandina agahdariya li ser karûbar, şert û mercên bazarê de jî dibe alîkar û avantajekê dide karsazan ku bi awayekî biryaran hîn bibin û karê xwe bi rêk û pêk bikin. Grin (1999, 18-23) dibêje ku bandora standardkirina zimên li ser bazirganiyê bi taybetî di kêmkirina bihabûna mesrefan û di mezinbûna bazarê de xwediyê roleke mezin e. Bi kurtahî, dema zimanê standard hebe, mirov dikare gelek guherînên pozîtîf di pêşveçûna ziman, çand, perwerdehî û jiyana siyasî de bibîne û guherînên wiha di nav civakê de jiyana insanî rehetir dikin. Herweha, ev pêvajoyê bi xwe re pîrsgirêkên nû jî tînin.

3.2. Pirsgirêkên Standardîzasyonê yên Qadê

Cudahiya Erdnigariya Zaravayên Kurdî

Varyasyonên giring ên herêmî û devokî di nav kurmancî de ji bo afirandina standardeke yekgirtî ku hemu kurdîxêv bipejirînin carekê de dernakeve û pirsgirêk e. Ji ber tunebûna perwerdeyê, nêzikatiyeke hevpar çênabe û bi giştî peyv ji hev cuda ne. Izadî (2013: 343) behsa netewedewlet û neteweperweriya kurdan dike û dibêje ji ber berbelavbûna dewletên cuda, kurdî wekî zimanekê kêmar tê dîtin û ev rewş bi xwe re pirsgirêkan çêdike. Ji ber vê rewşê, yekitiyeke zimên ji nişka ve çênabe. Xebatên zimên bandorê li ser hevgerîna zimên dikin, lê zaravayên cuda û cudahiyan peyv û hevokan dikare serê însanan tevlihev bike yan jî dikare tercîha însanan biguherîne. Herçiqas zaravayên cuda hebin jî, her zarava di nav xwe de xwediyê guherînê cuda ne. Bo mînak, zaravaya kurmancî ji aliyê derdora 18 mîlyon însanan ve tê axivtin (Bourgeois-Gironde, 2021, 15). Di navbera Bakur, Bahdîn û Rojava de guherîna lînguîstîk û sosyoçandî hene. Matras û Reershemius (1991, 107-108) jî vê meseleye tînin zimên û dibêjin ku sê cure hene: varyasyona Silêmanî (ji bo soranî), ya Yekitiya Sovyetê (bi alfabeya kirilî) û ya Bedîrxanî. Ev her sê jî gelek berbelav in lewma dibêje ku xwendin û nivîsa kurdî bi xwe re rewşa duzimanî jî tîne. Hebûna zaravayên cuda rewşa standardkirina zaravayekî diwartir dike. Herwiha, mirov dikare di nav zaravayekê de guherîna peyv an hemanên zimên bibîne. Bo mînak li Qersê dibêjin “gazinç”, li hin herêmên din dibêjin “gazind” û li Mêrdînê dibêjin “gazin”. Ev varyasyonêk e ku mirov dikare guherîn û cudahiya peyvên bibîne.

Ortografî û Alfabe

Pirsgirekeke din ku derdikeve pêşîya mirovan cudahiya alfabeyên wekî latînî, aramî û kirilî ye. Li Bakûr û Rojava alfabeyên latînî, li Rojhilatê alfabeya erebî, li Başûr alfabeya erebî bi giştî tê bikaranîn lê daxwaza nêzikatiya alfabeya latînî jî ji ber sedemên medya û teknolojiyê tê dîtin. Herwiha li Rûsya û li Qafqasyayê bi giştî alfabeya kirilî tê bikaranîn. Nakokiyên li ser hîlbijartina herfan (latînî beramberî erebî û beramberî kirilî) û normên taybetî yên zimên, pêvajoya standardbûnê sist kiriye û hêj jî biryareke giştî di navbera çar hêlan de tune ye.

Peyvsazî û Termînolojî

Ji ber nebûna standardîzasyonê, gelek peyvên herêmî û cur bi cur tene bikaranîn. Gelek normal e ku di edebiyatê de cudahiya peyvên cur bi cur bê tercîhkirin. Lê ji bo famkirina giştî hebûn û bikaranîna peyvên giştî famkirina însanan û peywendiyên wan rehetir dike. Herwiha ji bo peyvên bi hezaran varyasyon hene ku tene bikaranîn. Bo mînak, ji bo mêrê pişê (paldûz), ev peyvên jêr tene bikaranîn;

Hevling, hîwer, hevçeng, hevbûk, hevzava, bacenax

Bilêvkirin

Di bilêvkirinê de, cudahiyan herêmî jî di axiftinê de bi rehetî tene dîtin, bi vî şêklî, ev ne pirsgirêk e lê dema peyv li gorî nivîsê bê nivîsîn, ev dikare bibe sedema tevliheviyê.

Bo mînak,

Bi giştî dema em pîrsa kesekî dikin em dibêjin “çawa yî?

Lê li çiyayên bilind wekî Serhedê dibêjin “çawa nî?

Rêziman

Di hemû zimanan de, pêvajoya standardîzasyonê rê dide hîlbijartina hinek qaîde û qûralên rêzimanê. Yanî ji bona zimanekê standard hebe rêzimana zimên bi cih dibe. Herwiha rewşa peyvên û ya rêzimanê ji hev cihê ne, guherîn û cudahiya rêzimanê ne qeysa ya cudarengiya peyvên e. Di teoriya guherîna zimanan de, tê şopandin ku rêziman û sentaksa zimanan gelek kêr diguherin, lê guherîna fonetîk gelek zêde ne. Ji ber vê yekê, tercîha rêzimanê dikeve nîqaşa zimannasên teswîrker (deskriptîf) an jî yên qaîdeperest/rêgezperstî (preskriptîf).

Bo nimûne,

Mijara ergatîvîyê li gelek deverên wekî Amed, Mêrdîn û Elihê hatiye guhartin, lê li Cizîr, Wan û Colemergê bi giştî xwe parastîye. Bi saya bikaranîna pirtûkên hînkirinê û perwerdeyên mastira bêtez û bitezê gelek kes ji wan

qaîdeyan haydar bûn û hewldana bikaranîna rast dîsa derket holê.

Wekî li vir jî xuya ye Baran pêşniyaz û tercîha xwe tîne zimên û ji qad û şexsan mînakên dide ku daçekên navborî çima divê bêne tercîhkirin. Di nivîsa xwe de, behsa Mîr Celadet dike ku wî her du awayên daçekan bi kar aniye û şîrove dike. Wekî tê dîtin bi vî şêklî pêşniyaz hene. Herwiha, ev biryar hêj jî tê nîqaşkirin û gelek enstîtû, weşanxane, sazî û weşanên medyayê hêj ev biryar û yên din qebûl nekirine û nerazîbûna xwe nîşan didin.

Tunebûna konsensûsê

Di navbera saziyan de konsensuseke giştî tune ye. Ji ber vê medya, weşanxane, weqîf, komele, beşên zanîngehê bi serê xwe tevdigerin. Lê gelek saziyên medyayê û weşanxanê bi giştî li gorî ekola C. Bedirxanî dinivîsin.

PÊŞNIYAZ

Mirov dikare kêşeyên standardîzekirina kurmancî vekolîne, bi taybetî pîrsgîrêkên dîglosîkî û hîyerarşiyên li ser prestîjê derdikevin holê. Ev rewş di prosesên plansaziya zimên de tê dîtin û ev sedemeke giring e ji bo negihîştina biryareke hevpar. Di rewşa kurdî de, ku zaravayên wekî kurmancî (varyasyonên din wekî badînî) formên xwe yên standard pêş xistine. Wekî Suzan Gal (1989, 348-350) îfade dike pêvajoya standardîzasyonê dikare ji ber hinek sedemên cuda cot dîglosiyek derxe. Bi giştî du sedem hene ji bo vê cudahiye; yek hîyerarşiya rewşa zimanên serdest (dominant) û bindest (subordinate). Niha ji bo kurmancî jî du standardên cuda yek li Bakur (kurmancî) û ya din jî li Başur (Kurmanciya Badînî/Bahdînî) du meylên cuda ji ber sedemên cografî derketine. Di destpêka xebatên xwe de heger her du herêm bi hev re di nav pêwendiyê de bûna, dê ev cot-standardîzasyon derneketina. Elbet, mirov dikare vê rewşê ji ber hebûna du welatên cihê wekî rewşeke xwezayî jî qebûl bike. Sedema duduyan jî ku Gal (2006, 170) îfade dike zarava yan jî devoka ku tê hîlbijartin dibe xwedî prestîjeke mezin û di nav civakê de axiverên zarava û devokên din xwe di hawirdoreke ne ewle de hîs dikin. Ji ber vê sedemê dikarin li hemberî biryara girtî derkevin. Gal (2006, 170) wiha şîrove dike:

Dema ku standardek nû (herêmi) çêbibe, nakokîyek taybetmendî ya nîrxan derdikeve holê: gava ku hin form bi plansaziya zimên wekî yên standard tene hîlbijartin, hin axiver formên kêmaran (kêmetew) du qat dibin stigmatîzekirin. Ya yekem, ji perspektîfa dewletê ew ‘axiverên zimanê duyemîn’ yên zimanê neteweyî ne. Ya duyemîn, axaftina axaftvanên kêmarên ku formên wan ên zimanî di standarda nû de cih nagirin, ne têra xwe xuya dike û dibe ku ne rast be jî.

Ji bo berbelavkirin û standardîzasyona zimên hewce ye ku mirov di jiyana rojane de hinek tiştan bi kar bîne. Di pêvajoya standardîzasyona zimanan de normal e ku her welat an jî netewe bi awayekî din vê pêvajoya xwe pêk bîne. Herwiha, di vê pêvajoyê de hemanên çandî, civakî, siyasî û derfetên şexsî divê bînin dîtin. Plansazî divê li gorî zimên û çanda heyî bibe kirin. Bo mînak, li navçeyeke (Sîwereg) ku du zarava wekî kurmancî û kirmanckî tê axivtin divê cudahiya zaravayan neyê piştguhkirin. Dema rewşa giştî tê nîrxandin, pêwîst e ku plansaziyeke giştî bibe çêkirin û nexşerêya standardîzasyona zimên pêk bibe lewma mirov dikare xalên jêr pêşniyaz bike;

- » **Bikaranîna folklor, çand û wêjeyê:** Ji ber ku folklor gelek tiştên çandî û xwezayî di nav xwe de dihevine, hebûna wê bi awayekî diparêze û ji aliyekî jî rihê zimên diparêze. Zaravayên kurdî ji ber rewşa perwerdeyê di bin bandora zimanên din de mane. Lewma bikaranîna folklorê dê bi awayekî zindî zimên vegeirîne ser rihê wê yê giştî.
- » **Bikaranîna teknolojiyê (medyaya civakî, aplîkasyonên kurmancî û platformên înternetê):** Êdî di jiyana rojane de hema hema her tiştên me bi saya înternetê tên plankirin û em jiyana xwe li gorî wê eyar dikin. Lewma gelek giring e ku em bikarin di her cure platform û sîteyan de însanan marûzî kurdî û zaravayên wê bikin. Naverokên li gorî zarok, mezin, jin, perwerdehî, zanistî û gelek cureyên din dê berbelavkirina biryarên standard rehetir bikin. Bi taybetî û giştî jî zarok û nûciwan înternetê gelek bi kar tînin, ji ber wê em çiqas bigihîjin wan, dê karê me rehetir bibe.
- » **Zêdekirina bernameyên nivîs û xwendina kurmancî:** Di vê pêvajoyê de gelek kes ji tiştê zanistî, edebî yan jî întelektuelî aciz in û dema xwe piranî li ser vîdeoyên kurt yên platformên online derbas dikin. Herwiha ku asta xwendin û nivîsînê zêde bibe wê tîgihîştina însanan ya civakî jî zêde bibe. Gelo kêmasiya tunebûna perwerdeya zimên bi vî awayî çareser dibe? Dibe ku çareser nebe, lê ev dikare bibe jêrxaneke perwerdeyê.
- » **Saziyên zimên** wekî Akademî, komele, weqf, enstîtû divê bi hev re bixebitin û gelek xebatên hevpar çêkin. Wekî pêşniyaz, mirov dikare lijneyeke bi navê “*Komîteya Standardkirina Zimên*” ava bike û hemû qadên ku zimên bi awayekî aktîf bi kar tînin jî têvlî vê komîteyê bike.

- » **Alfabeyên** yekgirtî bêne bikaranîn dê zaravayên din jî nêzî hev bibin û wê demê dê standardên hevpar derkevin holê.
- » **Perwerde** xala herî giring e û divê bê berbelavkirin û perwerde ji pêşdibistanê heya xwendina bilind bê dayîn.
- » **Kontrola domeynan** ji aliyê axivêran bê kontrolkirin, bi taybetî li mal û cihên civakî ziman bê bikaranîn û malbat bi zarokên xwe re her daîm bi zimanê xwe biaxivin.

Santillan û Rodas (2020, 65) standardîzasyona zimên ji bo asteke çêtir wekî pêvajoya berxwedana civakî û dînamîkên pêşdebirina zimên qebûl dikin. Ji ber vê rewşê, divê mirov çanda xwe li gorî rewşên şênber û heyî binirxîne da ku ew dînamîkên navborî bêtir bi kêrî civakê bê.

Herwiha, di xebata Sangar (2020, 270) û yên din de em dibînin ku dema zimanê kurmançî wekî di jiyanê de (medya, perwerde, artêş, aborî û ol) dê bikaranîn, encamên ku bi dest dikevin gelek erênî û encamgir in. Encama herî mezin ya li berbiçav “zêdebûna hêmanên leksîkî û hêzîkirina zimên” e.

ENCAM

Standardkirina kurdî pêvajoyeke aloz û berdeham e ku pêwîstî bi hevkarî û têgihîştina civakên kurdîaxêv heye. Digel ku dijarî li aliyên cuda hebin jî, hêviyên standardkirinê koman û civakê ji bo yekîtiyê û xebatê teşwîq dikin. Standardkirina kurdî ne tenê dê nasnameya çandî ya kurdî xurt bike, lê di heman demê de dê ragihandin, perwerde û karên îdarî li herêmên navborî baştir bike û hesta yekîtiyê di nav kurdan de xurttir bike.

Bi kurtasî, standardkirina zimên bi destxistina naskirina siyasî, hêskirina ragihandinê û pêşvebirina rewşa aborî pêvajoyeke krîtîk e ku mîrateya zimên diparêze, perwerdeyê çêtir dike, civakan dike yek û piştgirî dide îfadeya çandî. Ev avantajên navborî giringiya dîrûdirêj a standardkirina zimanan ji bo pêşketina civakan radixe ber çavan. Lewma ev pêvajoyê ji ber parastin û geşkirina mîrasiya zimên, geşedana perwerdeya kurmançî, yekîtiyê, piştgiriya hêmanên çandî, naskirina siyasî, hêskirina ragihandin û transfera zimên û bi awayekî îndîrekt ji bo başbûna rewşa aboriyê gelek giring e.

Wekî encam divê

- » Pêvajoya standardkirinê baş bê nirxandin û kêmasî bêne tespîtkirin,
- » Hevkarî û famkirina di nav zaravayan de baş bê analîzkirin, modelên nû ji bo Bakurî bê derxistin,
- » Ragihandin, perwerde û qadên rêveberî bi hûrgilî bêne şopandin,
- » Qadên hinkirinê bê zêdekirin,
- » Yekîtiyê di navbera saziyan de çêbibe,
- » Medya û internet ji bo standardkirinê bê bikaranîn,
- » Pîrsgirêkên nîşankirî bêne nirxandin û çareserî bê dîtin,
- » Hêza zimên neyê jibîrkirin û di domeynên (qadên jiyanê) behskirî de bikaranîna wan bê bilindkirin,
- » Asta hinkirina zimên bê zêdekirin dê valahiya navbera perwerde û civakê kêmbibe,
- » Çêkirina yekîtiya neteweyî bi ziman pêk tê, lewma di qad û domeynên civakî de zimanê zikmakî bê tercîhkirin û bikaranîn,

Li gel van hewldanan jî, standardkirina kurmançî bi dijarî û zehmetiyên mezin re rû bi rû dimîne. Dijberiya siyasî, cudahiya zaravayên herêmî û nebûna otorîteya zimanî ya navendî pêvajoyê aloz dike. Lêbelê, destpêşxeriyên (hewldanên) berdeham ên saziyên çandî û akademîk ên kurdî, ligel zêdebûna bikaranîna platformên dijîtal, hêviya berdehamiya pêşketina hewldanên standardkirinê dide.

Her kom û beşa civakê bi zanîn, ezmûn, perspektîfa siyasî û pisporiya xwe li meseleyê dinêrîn û bi hêza xwe çavkaniyên wek perwerde, kovar, pirtûk û ferhengan çêdikin. Lê kêmasiya herî mezin a van lêkolînan ew e ku ji ber nebûna pêwendîya di navbera komên cuda yên rewşenbîr û akademîk ên ku di vî warî de dixebitin, pirî caran bi hev re tevnagerin an jî nikarin bi hev re bi awayekî sistematîk bixebitin. Ne tenê di zimên de lê di gelek mijarên cihê de jî divê mirov li mînakên neteweyî û heta herêmî yên li çar aliyê cihanê binêre û tiştên herêmî û yên gerdûnî bide ber hev û mînakên din binirxîne ku mirov bikaribe ji bo Bakur modeleke taybet ji bo standardkirinê derxe.

ÇAVKANÎ

- Akin, Salih. "Plansaziya Zimanî li Dîasporayê: Plansaziya Korpûs û ya Prestîjê ji bo Kurdî." *The Journal of Mesopotamian Studies* 3/2 (Summer 2018): 185–201.
- Akkuş, Mehmet. "COVID-19 Pandemisi (Karasalgın) ve Tehlike Altındaki Türk Lehçeleri: Küresel Karasalgın, Dilkırımı (linguicide) Tetikler mi?" *Tehlikedeki Diller Dergisi* 11/18 (2021): 158–174.
- Aktaş, Murat ve Mehmet Yonat. *Di Dema Osmaniyan de Çapemeniya Kurdî, Matbaeya Berdanê*. Stenbol, 2013.
- Aydın, Tahirhan. "Rêbera Rastnivîsînê Komxebata Kurmanciyê." *Kurdiname* 3 (2020): 138–142.
- Aydoğan, İbrahim Seydo. "Celadet Bedirxan, Çavkanîyên Hawarê û Kurdaniya Bîrewer." *Journal of University of Zakho* 1/B, no. 1 (2013): 21–40.
- Baran, Bahoz. *Pirsgirêka Dengê Daçekan*. Erişim: <https://www.amidakurd.net/pel/Pirsgir%C3%AAka-Deng%C3%AA-Da%C3%A7ekan.pdf>, 7 Haziran 2024, saat 10:43.
- Bedirxan, Celadet. *Hawar Journal*. Weşanxaneyê Belkiyê, 1932–1943.
- Bedirxan, Celadet. *Hawar*. Stockholm: Swêd, 1998, sayı 9, s. 7.
- Bedirxan, Celadet. "Xebata Peyvan." *Hawar* 1 (1941): 2.
- Bedirxan, Celadet. "Giringiya Alfabe-yê." *Hawar* 3 (1941): 4.
- Bedirxan, Celadet. "Sê Tarîxên Hawarê." *Hawar* 27 (1941): 5.
- Boscoboinik, Andrea. *Standardized Language as a Way to Support a Common Identity: The Case of Roma Communities*. Switzerland: University of Fribourg, 2008.
- Bourdieu, Pierre. *Language and Symbolic Power*. Cambridge: Polity Press, 1991.
- Bruinessen, Martin Van. *Agha, Shaikh, and State: The Social and Political Structures of Kurdistan*. London: Zed Books, 1992.
- Bourgeois-Gironde, Stéphane, Victor Ginsburgh, Hela Hassani ve Shlomo Weber. "A Lingua Franca for Kurdish Populations." *CEPR Discussion Paper* No. DP16086 (2021). hal-03982938.
- Crystal, David. *English as a Global Language*. Cambridge: Cambridge University Press, 2003.
- Coulmas, Florian. *Language and Economy*. Oxford: Wiley-Blackwell, 1992.
- Curzan, Anne, Robin M. Queen, Karlyn V. Weissler ve R. E. Weissler. "Language Standardization & Linguistic Subordination." *Daedalus* 152/3 (2023): 18–35. https://doi.org/10.1162/daed_a_02015
- Dean, M. B. ve E. D. Fowler. "An Argument for Appreciation of Dialect Differences in the Classroom." *The Journal of Negro Education* 43/3 (1974): 302–309.
- Dilgeş, Felat. "Celadet Berdirxan ve Hawar Ekolü." İçinde *Înatçı Bir Bahar: Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat*, ed. Vecdi Erbay, 49–62. İstanbul: Weşanên Ayrıntıyê, 2012.
- Ergün, Zülküf. *Plandanîna Zimanê Kurdî (Kurmancî–Sorani) di Minakên Kori Zanyari Kurd û Enstituya Kurdî ya Parisê da*. Teza doktorayê. Danışman: Doç. Dr. Osman Aslanoğlu. Dicle Üniversitesi, 2024.
- Fellman, Jack. *The Revival of a Classical Tongue: Eliezer Ben Yehuda and the Modern Hebrew Language*. Mouton, 1973.
- Ferguson, Charles A. "Standardization as a Form of Language Spread." In *Sociolinguistic Perspectives: Papers on Language in Society, 1959–1994*, edited by T. Huebner, Oxford: Oxford University Press, 1996.
- Fishman, Joshua A. *The Sociology of Language: An Interdisciplinary Social Science Approach to Language in Society*. Newbury House, 1972.
- Fishman, Joshua A. *Advances in Language Planning*. Mouton, 1974.
- Gal, Susan. "Language and Political Economy." *Annual Review of Anthropology* 18 (1989): 345–367.
- Gal, Susan. "Contradictions of Standard Language in Europe: Implications for the Study of Practices and Publics." *Social Anthropology* 14/2 (2006): 163–181. <https://doi.org/10.1017/S0964028206002515>.
- Garvin, Paul L. "A Conceptual Framework for the Study of Language Standardization." *International Journal of the Sociology of Language* 100/101 (1993): 37–54. <https://doi.org/10.1515/ijsl.1993.100-101.37>.
- Geyik, Resul. *Teoriya Hinkirina Kurdî-Kurmancî*. Mersin: Weşanxaneyê Azad Yayıneviyê, 2020.
- Grin, François. "Economics of Language: Selected Papers." *International Journal of the Sociology of Language* 137 (1999): 15–33.
- Hassanpour, Amir. *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil, 1918–1985*. İstanbul: Weşanxaneyê Avestayê, 1997.
- Hassanpour, Amir. "The Making of Kurdish Identity in Iran: A Historical Perspective." In *The Kurdish Question in U.S. Foreign Policy: A Documentary Sourcebook*, Costa Mesa: Mazda Publishers, 2003.
- Haugen, Einar. *Language Conflict and Language Planning: The Case of Modern Norwegian*. Cambridge, Mass: Harvard University Press, 1966.

- Haugen, Einar. "Dialect, Nation, Language." *American Anthropologist* 68/4 (1966): 922–935.
- Holmes, Janet. *An Introduction to Sociolinguistics*. 2nd ed., London: Pearson, 1990.
- Holmes, Janet. *Learning About Language: An Introduction to Sociolinguistics*. Edinburgh Gate: Edinburgh University Press, 2001.
- Hudson, Richard A. *Sociolinguistics*. 2nd ed., Cambridge: Cambridge University Press, 1996.
- Joseph, John E. *Eloquence and Power: The Rise of Language Standards and Standard Languages*. London: Pinter, 1987.
- Izady, Mehrdad R. "Distribution of Kurdish Language and Its Major Dialects." In *Atlas of the Islamic World and Vicinity*, Gulf/2000 Project, Columbia University, 2006–present.
- Izady, Mehrdad R. *Kürtler: Bir El Kitabı*. 4. baskı. Çev. Cemal Atilla. İstanbul: Weşanxaneyê Dozê, 2013.
- Keskin, Necat. "Kovargerîya Akademîk a Kurdî li Tirkîyeyê û Pirsgirêkên Wê." *Mukaddime* 9/2 (2018): 31–47. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.369647>.
- Keskin, Necat. "A Critique of the Kurdish Working Group's Writing Guide in Terms of Methodology and Scientific Ethics." *International Journal of Kurdish Studies* 9/1 (2023): 55–70. <https://doi.org/10.21600/ijoks.1234239>.
- Kreyenbroek, Philip G. "On the Kurdish Language." In *The Kurds: A Contemporary Overview*, 75–80. London: Routledge, 1992.
- Kurt, Şehmus. *Türkiye'de Kürtçe Öğretim Deneyiminin İncelenmesi (1968–2018)*. (Yayımlanmamış Doktora Tezi). Diyarbakır: Dicle Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, 2020.
- Kurt, Şehmus. "Kürtçe İçin İlk Dil Planlaması Örnekleri: Rojî Kurd ve Hetawî Kurd." *Kebikeç: İnsan Bilimleri İçin Kaynak Araştırmaları Dergisi* 52 (2021): 223–237.
- Kurt, Şehmus. "Ekoleke Berdewam: Plansaziya Zimanî." In *Ekoller ve Kurumlar: Dil Bilimleri*, ed. M. N. Doru ve K. Gökdağ. Mardin: Artuklu University Publishing, 2022.
- Lane, Pia. "Minority Language Standardisation and the Role of Users." *Language Policy* 14 (2015): 263–283. <https://doi.org/10.1007/s10993-014-9342-y>.
- Matras, Yaron ve Gisela Reershemius. "Standardization Beyond the State: The Cases of Yiddish, Kurdish and Romani." In *Standardization of National Languages: Symposium on Language Standardization*, ed. Utta von Gleich ve Ekkehard Wolff, 2–3 February 1991. Hamburg: UNESCO Institute of Pedagogy, 1991.
- McDowall, David. *A Modern History of the Kurds*. London: I.B. Tauris, 2004.
- Milroy, James ve Lesley Milroy. *Authority in Language: Investigating Language Prescription and Standardisation*. 3. baskı. London: Routledge, 1999.
- Mehmûd, Bedirxan. "Li Suriyeyê Fêkirina Zimanê Kurdî." *Zend* (2008): 126–128. İstanbul: Zend Bilim Kültür Eğitim Yayıncılık.
- Omer, Fazil. "Standardîzasyona Zimanê Kurdî." In *Înatçî Bir Bahar: Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat*, ed. Vecdi Erbay, 75–82. İstanbul: Weşanên Ayrıntiyê, 2012.
- Ramlan, Renî. "Language Standardization in General Point of View." *Budapest International Research and Critics Institute (BIRCI) Journal* 1 (Şubat 2018): 27–33. e-ISSN: 2615-3076.
- Reşîd, Têmûr. "Wêjeya Kurdî li Yekitiya Sovyetê." In *Înatçî Bir Bahar: Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat*, ed. Vecdi Erbay, 202–212. İstanbul: Weşanên Ayrıntiyê, 2012.
- Orak Reşitoğlu, Sevdâ. "Normên Rastnivîsîna Hawarê." *Nûbihar Akademi* 20 (2023): 10–32. <https://doi.org/10.55253/2023.nubihar.1377981>.
- Önen, Ronayî. "Perwerdeya Zimanî di Aktîvîzma Zimanî da; Tecrûbeyê TZP Kurdî." In *Perwerde û Hînkirina Kurdî: Tecrûbe – Model – Pêşniyaz*. İstanbul: Weşanên Weqfa İsmail Beşikçi, 2020.
- Sangar, İbrahim, Abdulmenaf Jukil ve George Beckett. "The Impact of the Kurdish Language on the Components of Nation Building and the Impact of the Components of the Nation Building on the Kurdish Language." *Zanco Journal of Humanity Sciences* 24 (2020): 258–272.
- Santillan, Juan Jose ve Fabian Dario Rodas. "Brief Considerations on Language Standardization and Intra-Language Change." *International Journal of Arts and Social Science* 3/2 (Mart–Nisan 2020). <https://www.ijassjournal.com> (Erişim: 15.06.2024).
- Schwarzwald, Ora R. "The Standardization of Modern Hebrew." *International Journal of the Sociology of Language* 150 (2001): 147–160.
- Sheyholislami, Jaffer. "Identity, Language, and New Media: The Kurdish Case." *Language Policy* 9/4 (2010): 289–312.
- Skutnabb-Kangas, Tove ve David Fernandes. "Linguistic Diversity and Language Rights: The Role of the Kurdish Institute of Paris in Promoting Kurdish Language Rights." *International Journal of the Sociology of Language* 192 (2008): 85–98.
- Skutnabb-Kangas, Tove ve Teresa L. McCarty. "Key Concepts in Bilingual Education: Ideological, Historical, Epistemological, and Empirical Foundations." In *Encyclopedia of Language and Education*, 155–166. Springer, 2008.
- Stadler, Bettina. *Language Maintenance and Assimilation: The Case of Selected German Speaking Immigrants in Vancouver, Canada*. Canadian Cataloguing in Publications Data, 1983.
- Tharu, Ram Krishna. "Standardization of the Tharu Language: A Critical Analysis." *Voice: A Biannual & Bilingual Journal* 15/1 (Ağustos 2023): 45–54.

- Thomas, Wayne P. ve Virginia P. Collier. *School Effectiveness for Language Minority Students*. NCBE Resource Collection Series 9. National Clearinghouse for Bilingual Education, 1997.
- Thomason, Sarah G. *Language Contact: An Introduction*. Edinburgh: Edinburgh University Press, 2001.
- Toprak, Berfin. *Serboriya Hewldanên Standardkirina Kurdiya Kurmancî li Tîrkiyeyê (Ji Kovara Hawarê Heta 2022yan)*. (Yayimlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi, 2022.
- UNESCO. *The United Nations Educational, Scientific, and Cultural Organization*. 1968.
- Yıldız, Kerim. *The Kurds in Turkey: EU Accession and Human Rights*. London: Pluto Press, 2005.
- Zeydanlıoğlu, Welat. “Turkey’s Kurdish Language Policy.” In *The Kurdish Question in Turkey: New Perspectives on Violence, Representation, and Reconciliation*, 157–176. London: Routledge, 2012.
- Wardhaugh, Ronald. *An Introduction to Sociolinguistics*. Malden, MA: Blackwell Publishing, 2006.
- https://archive.org/details/kovara_kurmanci/ku1/
- <https://bahozbaran.wordpress.com/2020/02/13/weqfa-mezopotamyaye-xebaten-zimani-u-komxebata-kurmanciye/>
- <https://zimannas.wordpress.com/2020/02/22/pedacuneke-rexneyi-li-ser-rebera-rastnivisine/>
- <https://xwebun2.org/nu-ez-deyndare-zimane-xwe-me/>
- https://ku.wikipedia.org/wiki/Konferansa_Zanist%C3%AE_ya_Ziman%C3%AA_Kurd%C3%AE_2011

EXTENDED ABSTRACT

The standardization of the Kurdish language, specifically the Kurmanji dialect, constitutes a multilayered and ongoing linguistic, sociopolitical, and cultural project. This paper investigates both the objectives and enduring challenges of this process through a pluri-centric and process-oriented lens, with particular attention to the historical, ideological, and practical dynamics that have shaped its route. Drawing upon Haugen's four-phase model of language standardization—selection, codification, elaboration, and acceptance—the article situates the Kurmanji standardization effort within a broader typology of minority language planning movements, while emphasizing its unique geopolitical fragmentation and diasporic influence.

The first objective of standardizing Kurmanji is to facilitate communication, education, and official language use across Kurdish-speaking communities spread across nation-states such as Turkey, Syria, Iraq, and Iran, each of which hosts distinct dialectal variants and institutional policies. Standardization is seen not merely as a linguistic endeavor but as a cultural, pedagogical, and nation-building act—a tool for consolidating ethnic identity, enhancing the functionality of Kurdish in modern domains, and resisting linguistic marginalization.

However, the process is beset by numerous challenges. Among the most significant are: (1) political fragmentation and lack of state support for Kurdish in many regions; (2) deep dialectal variation between Kurmanji, Sorani, and Zazaki/Kirmanjki; (3) the absence of a unified orthographic and grammatical framework; (4) underrepresentation in formal education and media; (5) limited production and dissemination of standardized pedagogical materials; and (6) controversies over linguistic purity, borrowing, and pronunciation norms. These issues result in a high degree of variability across texts, institutions, and speaker communities, complicating the formation of a broadly accepted standard.

Historically, the initial efforts in Kurmanji standardization trace back to the early 20th century with periodicals such as *Hawar* (1932–1943), spearheaded by Celadet Alî Bedirxan. *Hawar* played a crucial role in developing Latin-based orthography and set the groundwork for future grammatical and lexical norms. The paper meticulously documents Bedirxan's strategies, including the “Ferhengok” columns, where he introduced lexical items and their meanings, often providing equivalents in French. These early interventions created a foundational corpus that subsequent efforts have either built upon or critiqued.

Later developments include Soviet-era standardization projects in Armenia and Georgia, which employed Latin and later Cyrillic scripts, particularly in the 1920s and 1930s. Although these initiatives were geographically limited, they contributed significantly to the pedagogical and academic infrastructure of Kurdish. Parallel efforts in Iraqi Kurdistan since the 1970s, including the establishment of the Kurdish Academy and the adoption of Kurdish as an official language, also played an instrumental role. Here, standardization focused more on Sorani, yet the implications extended to Kurmanji as well.

The Kurdish diaspora, particularly in Europe, has become a crucial actor in recent decades. Institutions such as the Kurdish Institute of Paris and the Kurmancî journal have provided platforms for ongoing linguistic debates and proposals. The article classifies these diasporic efforts as a kind of transnational language activism that seeks to circumvent the absence of a central Kurdish state by fostering scholarly and community consensus across borders. A notable outcome of these endeavors is the proliferation of grammar books, orthographic guides, and digital resources aimed at educational and media use.

In Turkey, post-1990 efforts have been more decentralized, involving civil society organizations, private publishing houses, and cultural associations such as the Mesopotamia Foundation and Nûbihar. These groups have initiated language courses, teacher training, and produced orthographic guides—most notably the *Rêbera Rastnivîsînê* (*Guide to Correct Writing*). However, the reception of such guides has been mixed. The article analyzes in detail the criticisms and discussions surrounding this particular guide, highlighting issues such as inconsistency in phoneme representation, use of apostrophes, treatment of proper nouns, and inclusion of Arabic-origin terms.

Through an analysis of critiques published in journals, social media, and academic theses, the author identifies four primary social responses to the standardization attempts, drawing upon Lane's (2014) classification: (1) Rejecters—those who oppose standardization entirely; (2) Resisters—who accept some components but resist others; (3) Excluded—those who lack access to standard resources; and (4) Expelled—those whose views are marginalized or ignored in the standardization discourse. These reactions underscore the complexity of achieving linguistic unity in a highly politicized and culturally diverse context.

Methodologically, the article adopts a sociolinguistic approach informed by pluri-centric language planning models, acknowledging that Kurdish—like many stateless languages—cannot follow a top-down, state-driven model. Instead, it relies on collaborative, multi-actor processes involving scholars, writers, educators, and media professionals. The author suggests that any successful standard must balance between linguistic precision and broad social acceptance, avoiding exclusion of regional varieties and community-specific usages.

In conclusion, the article argues that while no final “standard Kurmanji” has yet emerged, the accumulation of decades of academic, cultural, and pedagogical labor has produced a growing body of norms and expectations. Standardization is viewed not as a static endpoint but as an evolving dialogue among Kurdish speakers. The trajectory of Kurmanji standardization, though fragmented and contested, continues to reflect the aspirations of a dispersed people to secure linguistic unity, cultural expression, and political recognition in a multilingual world.